



REWŞA GELÊ BAŞÛRÊ KURDISTANÊ JI BER DESTÊ HÊZÊN BIRAKUJ HER DIÇE XERAB DIBE

PDK Û YNK JI BIRAKUJIYÊ PIR HEZ DIKIN!

● Ji havîna salaçûyi bi vir ve li başûrê Kurdistanê di navbera herdu hêzên sereke; PDK û YNK'ê de şerekî xwekuj, dem bi dem dest pê dike û disekine. PDK û YNK, guh nadin daxwazên gel, ji bo berjewendiyêñ madî û bi handana (teşwîqkirin) hêzên biyan xwîna hev dirêjin.

● Ev şerê ku havîna sala çûyî dest pê kir, di gel çend peymanen ku serokên herdu hêzan îmze kirin, nesekinî û nayê zanîn ka wê kengê bi tamamî bisekinne. Di vî şerê navxweyî de ji destpêkê heta niha zêdetirî hezar kesî hatine kuştin.

Rûpel 2-3


Çiroknivisê kurd Evdilhelim Yûsif ê "ji Amûda şewiti" nêrînên xwe yêñ bikul û cihêreng ji Welatê Me anîn zimên:

'EZ LAWÊ DU HEZAR Û ŞEŞ SED SAL JI TOZÊ ME'

● Têkiliyên min bi kesen çirokên min re bêsinor in. Her kesek ji wan û têkiliya min pê re, bi rengekî ye. Ez wan li ser kêfa wan dihêlim. Geh ez bi wan dikarim, geh ew jî zora min dibin. Lê her tim ew bi zimanê xwe dipeyivin û bi lingên xwe dimeşin û ez jî deriyên çirokan li ber wan vedikim. Ta ku bêñ ber çavan.

● Xwîna me jî roja roj ve heder bûye. Em kengê bûne xwediyê xwîna xwe heta îro ku em jî kuştinê bitirsin? Ez azad im di nêrînên xwe de heta da wiyyê. Tu tişt li dînyayê çavêñ min naşkîne, ji ber ku tu tişt tune ku ez li dû xwe bihêlim û li ser bigirîm. Çawa mirov tazî tê, wilo jî tazî diçe.

Rûpel 8-9



Yaşar Kemal:
'Zilma te
zêde bibe"

Nivîskarê kurd ê navdar Yaşar Kemal ji ber nivîsên xwe careke din li DGM'ê ifade da. Roja 9'ê reşemiyê dozgerê DGM'a Stenbolê ji ber du nivîsên wî yên ku di pirtûka "Azadiya Eşkerekirina Ramanê û Tirkîye" de cih girtine, ifadeya Y. Kemal stand. Navê du nivîsên wî yên ku bûne mijara dozê, "Bila zilma te zêde bibe" û "Asîmanê reş ê li ser serê Tirkîyeyê." Piştî ku ifadeya xwe da, Yaşar Kemal ev daxuyanî da çapemeniyê: "Cudaxwazî ne bi kêrî tirkan ne jî kurdan tê. Bila kuştin bisekinin. Ji bo ku Welatê Me birûmet derbasî sedsala 21. bibe, em vê cenga qirêj bisekinin. Ji bo sekinandina wê, ezê bi salan têbikoşim."

Min dûjmîni
birakûj im


Mûmkîn niye be hîc şêweyek her mirovêk xoy be kurd bizanê, be tek em xak û welat ewe bê, be hîc şêweyek nabê tebrîri birakûjî bikat. Birakûjî xiyanet e, bêşerefanetirin şer, şerî birakûjî ye. Namerdanetirin şer, şerî birakûjî ye.

Rûpel 7

Li ser tiliyên
lîngan reqs,
evîn û muzîk

Saet di 20.00'an de li Berlînê li Şanoya Komishe OPER'ê bi dengê rîtma daholeke bilind, rîwîngiyek dest pê dike. Çavdêrên vê holê, dikevin nava deryaya notayan û tevî şahoyê spî li ser ewrêñ tîrêjan digerin.

Rûpel 12





JI ROJEVE

Şerê kurdkujiyê

bi kêrî kê tê?

Ji havîna sala çûyi
bi vir ve li başûrê
Kurdistanê di
navbera herdu
hêzên sereke; PDK
û YNK'ê de şerekî
xwekuj, dem bi
dem dest pê dike
û dîsekine.

PDK û YNK,
guh nadin
daxwazên gel,
ji bo berjewendiyê
madî û bi handana
(teşwîqkirina)
hêzên biyan xwîna
hev dirêjin. Bi
awayê ku tê gotin
sedema vî şerê
dawîn yê rastin,
dahatiya deriyê
Xabûrê ye. Ev şerê
xwekujiyê rewşa
başûrê welêt dixe
nava xetereyê.
Her çiqas, pêşî ev
şer wekî şerê
PDK û YNK'ê xuya
dike jî, dema
mirov hinekî lê hûr
û kûr dinêre

li pişt van herdu
hêzan dewletên
mezin derdikevin
meydanê; li pişta
PDK'ê Almanya,
Fransa
û dewletên ku
Kurdistan li hev par
kirine dixwazin,
hêzên Başûr bi
Sedam re li hev
bînin, li aliye din
Amerika û İngiltere
li pişta YNK'ê ne,
diwazin rewşa heyî
bê parastin.

Ji bo ku dawî
li vê rewşa xerab
were pêdivî bi
hêzeke ku pişta
xwe dide gelê
kurd heye.

REWŞA GELÊ BAŞÛRÊ KURDISTANÊ JI BER DESTÊ HÊZEN
BIRAKUJ HER DIÇE XERAB DIBE

PDK Û YNK JI BIRAKUJİYÊ

PIR HEZ DIKIN!

L i Başûr şerê di navbera du hêzên sereke; YNK û PDK'ê de demeke kin sekinî û bi nû ve dest pê kir. Di destpêka hefte de ji aliyê Nûnergeha YNK'ê ya li Enqereyê ve hate gotin ku şer bi temamî rawestiyaye, lê hêj di navbera herdu hêzan de peyman nehatiye imzekirin. Roja 9'ê reşemiyê rojnameya Cumhuriyetê li gorî agahiyê IRNA'yê (ajansa Îranê) daxuyand ku li Rewandizê şer ji nû ve dest pê kiriye û piştî êrîşen tund yên PDK 40 mirov – bi piranî sivil- hatine kuştin. Rayedarekî YNK'ê (navê xwe neda) ji Nûnergeha Enqereyê destpêkirina şer tesdiq kir, lê hejmara zaiyatana tesdiq nekir. Ev şerê ku havîna sala çûyi dest pê kir, di gel çend peymanan ku

serokên herdu hêzan imze kirin, nesekinî û nayê zanîn ka wê kengê bi tamamî bisekine. Di vî şerê navxweyî de, ji destpêkê heta niha zêdetirî hezar kesî hatine kuştin.

Peymanê
li ser kaxizan
Cara dawîn peyma-

Li gorî pirtük û qanûnên civakî, ji bo neteweyekê mirov nikare behsa 'qeder'ê bike. Lê belê, tu pirtük û qanûnên civakî jî nikarin behsa vê qansêrê bikin û rewşa Kurdistanê salox bidin. Baş e, ku 'birakuji' ne 'qeder' e, ci ye? An jî ku qeder be, wê çawa bê guhertin? Ji bo kurdan ev pirs girîng in ku bêne bersivandin. Heta îro li ser vê nexweşîya gelê kurd, pir hat sekinîn. Li ser pir hat xeberdan, pir tişt hatin nivîsandin. Pir lanet hat barandin, pir nifir hatin kirin. Peyman çebûn, soz hatin birîn, sond hatin xwarin... Lê ci feyde... Di destê gelê kurd de "lê'yeke vala û mezin ma, bi tenê "Lê". Dîrok li welatê kurdan dîsa li ser şopa kevin meşîya û karwanîn birakujiye li her qonaxê li ser keze-



Berzanî û Telabanî di dema şerrawestandinê de bi hev re dixuyin.

serokên herdu hêzan imze kirin, nesekinî û nayê zanîn ka wê kengê bi tamamî bisekine. Di vî şerê navxweyî de, ji destpêkê heta niha zêdetirî hezar kesî hatine kuştin.

Peymanê
li ser kaxizan
Cara dawîn peyma-

na ku hatibû imzekirin ji aliyê PDK'ê ve hate îhlalkirin. Roja 16'ê berfanbarê pêşmergeyên PDK'ê êrîş birin ser gundên eşîra Herkî, ji ber ku giregirên eşîre çûbûn serdana Telabanî. Li ser vê bûyerê hêzên YNK'ê jî roja 18'ê ber-

fanbarê êrîşî ser hêzên PDK'ê yên li Silêmaniye kirin.

Xebatê
sekinandina şer
Di nava çend rojan de şer li seranserê Başûr belav bû. Gelek bajar, navçe û nahiye yan du-sê caran dest

gûhertin. YNK'ê kontrola Hewlêrê bi dest xist û ew der radestî Kongreya Neteweyî ya Iraqê (KNI) kir. Di nava du heftiyan de zêdetirî 200 kesî hatine kuştin. Li gorî agahiyê KURD-A'yê piştî 10'ê rîbêndanê xebatê

Birakuji ji bo kurdan qeder e?

ba kurdan reqsa kabûsê lîst û ji wijdanê kurdan parçeyek jêkir.

Em li gorî dîtinên xwe bersivên pirsên xwe bidin. Pirsa yekemîn: Birakuji qedera kurdan e? Li gorî wateya ku gotina 'qeder' tîne hişê mirov, ji bûyer û diyarde yên (fenomen) ku bûne

kevneşopî re jî mirov dikare

bibêje qeder. Lê di mantıqa 'qeder'ê de îrade ji aliyê hinekîn din tê xebitandin! Bi rastî li gorî min pîrsa kurdan a herî mezin jî ew e, ku îradeya wan ne di destê wan de ye. Li gorî pozîsyona wan a li hemberî îradeya wan mirov dikare bibêje, birakuji qedera wan e. Pirsa îradeye

ANALİZ

ye ku bi Lenîn, gotina "tayînkirina qedera neteweyan, gerek e di destê wan de be" daye gotin.

Birakuji, ji bo gelên cîhanê û ji zanistiya vê şaristaniya îro re wekî nexweşîya webayê ye. Ji demê der e û kabûseke kevin e. Gelên cîhanê piranî wê nexweşiyê

bi dehan sal berê derbas

kirin û li dijî vê mîkrobê şerekî dijwar dane.

Bila kes bawer neke ku, îro şerê birakujiye bi gotinên Barzanî û Telabanî karê bê sekînandin. An jî bi çûna Berzanî û Telabanî ev şer wê bê şikandin. Ev xeyaleke erzan e, ne zanistî ye.

Di her teqînên tifingên kur-

dan ên li dijî hev, bêhemd awaza Hecî Qadirê Koyî tê bîra mirov:

"Ta rîk nekewin qebîl ekrad Her wa debîne, xirabê abad" Yanê heta aşî nekeve nav qewmê kurd Wê bimîne xirabe, welatê kurd.

Ew nesîhetên Koyî sed sal berê bûn. Lê sed sal bi şûn de jî dîsa kurd hewcîyî van şîretan in, sed mixabin!

Ev nexweşîn wê rojek were ji laşê kurdan derkeve. Ev taya ku Kurdistan pê ketiye wê bisekine. Lê wijdanê kurdan wê pir bişewitîne. Berdêla çareserkirina vê şîrpenceyê wê giran be, lê ji bilî vê çare nîn e. Kurd bi sedan sal e êşê dikişînin, dermanê herî mezin zeman e.

SEYIT ÇIYA

JUTI



şerrawestinê dest pê kirin, lê ew xebat bi ser neketin. Demekê berê delegasyoneke ji amerîkî û tirkan pêkhatî, li Başûr di gel Telabanî û Berzanî cîvînek li dar xist. Wan ji herdu serokan xwest ku şer bisekine, lê li ser plana aştiyê du bendî di navbera Tirkîye û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) de jî heye. Amerîka dixwaze ku plana aştiyê ya KNI'ye bê qebûlkirin. Li gorî vê planê divê hêzên leşkerî yên herdu aliyan ji Hewlîrê vekişin, dahatiya (gelir) Başûr li herdu hêzan nîvenîv pay (dabes) bibe û li Başûr hilbijartineke nû çêbe. Li aliye din Tirkîye naxwaze ku hilbijartin çêbe, ji ber ku Tirkîye hilbijartinê wekî gaveke ber bi dewletbûnê ve dinirxîne û dixwaze ku Telabanî û Berzanî bi Sedam re li hev bikin. Tırsa Tirkîye yeyê ya herî mezîn xurtbûna PKK'ê û serxwebûna gelê kurd e. Ji ber vê sedemê ew rasterast piştgiriyê di de Berzanî û dixwaze serxwebûna fiilî ya Başûr ji holê rake. Roja 14'ê rîbendanê Telabanî li hemberî gefxwarineke Tirkîye yeyê derketibû û dabû zanîn ku Tirkîye di şer de ne bêteref e. Dîsa tê gotin ku herdu hêzên Başûr jî ji xurtbûna PKK'ê ditirsin.

SAMÎ BERBANG

Parlementoya surgunê li Londonê

Xebatê li ser avakirina Parlamento Kurdistanê ya li Derve dom dikan. Yek ji van çalakiyan di 5'ê vê mehê de li Londonê, li paytexta Îngîlîstanê pêk hat. Li ser navê Komîteya Amadekar a Parlamento Kurdistanê Ali Yiğit, Yusuf Serhat Bucak, Sinan Dağ, Zeki İnanç û siyasetvanê

armancê parlametoyê, pêdiviya wê û prosedura hilbijartîne' de agahî dan besdarê civînê ku hejmara wan li seriya 500 kesî bûn. Ji aliye din ve ji endamê Komîteya Amadekar a Parlamento Kurdistanê Ali Yiğit, Yusuf Serhat Bucak, Sinan Dağ, Zeki İnanç û siyasetvanê

kurd Maşallah Öztürk, li herêma Evingê ku li ser Dortmunda Almanyâye ye, civînekê ji bo gel pêk anîn. Civîn bi "Ey Reqîb" vebû û axaftina pêşîn Maşallah Öztürk kir. Pişt re Zeki İnanç li ser sebebîn avakirina parlamento, Ali Yiğit, li ser armancê wê û Y.Ser-

hat Bucak jî li ser prosedura hilbijartîna Parlamento li Derve sekinîn. Di vê civîna ku roja 5'ê reşemiyê li Salona Dîlanê ya Maksîmê pêk hat, zêdetirî 2000 kes besdar bûn. Beşdar jî bi pîrsen xwe tevî axaftin û guftûgoyan bûn.

Kurd-A

Rêxistina HADEP'ê ya Bağcılar'ê şahiye li dar xist

'Gelê kurd ne bêpartî ye'

Rêxistina HADEP'ê ya Bağcilara Stenbolê şahiye li navenda xwe li dar xist.


Serokê navçeyê Selahattin Sarıkamış di şahiye de axaftinek kir û gote ku gelê kurd ne bêpartî ye.

Şahî, roja 5.2.1995'an saet li dora 13.00'yan li navenda rêxistinê çêbû. Hunermendê ji Navenda Çanda Mezopotamyayê bi stranê xwe besdaran ku zêdetirî 500 kesî bûn, çosand.

Serokê navçeyê Selahattin Sarıkamış ji besdaran re axaftinek kir û bala kesen ku hatibûn çalakiyê kişande ser polîtikayê partiyen mîna SHP û YDH'ê.

Sarıkamış axaftina xwe wiha dewam kir:

"YDH piştî wan sloganên xwe yê ji bo azadiyê, aştiyê, yekîtiyê(!) iro serokê komaleyên nîjadperestan (Ülkü Ocağı) ji xwe re kiriye



Serokê HADEP'a Bağcılarê Selahattin Sarıkamış: "HADEP, partiya kurdan, lazan, ereban, tîrkan û ya hemû gelên bindest e."

endamê Meclîsa Partiyê. Em careke din jî, ji vir bang dikan û dibêjin: HADEP partiya kurdan, lazan, ereban, tîrkan û ya hemû gelên bindest e."

Serokê HADEP'a Bağcılarê Selahattin Sarıkamış, di axaftina xwe de bal kişand

ser girtina Özgür Ülkeyê û xwest ku kurd li saziyen xwe xwedî derkevin.

Di şahiye de gelek mesaj jî hatin xwendin, şev bi stranê Ozan Xanemîr qediyâ.

CEWDET QUŞMAN

Dewletê Rojnameya Özgür Ülke girt

Rojnameya özgür Ülke di 2'yê reşemiyê de bi qerara Mahkemeya Suh Cezayê ya Stenbolê hate sekinandin. Sekinandin Özgür Ülkeyê bi qanûna çapemeniyê ya madeya 2/2'yan, bi idîaya ku ev rojname domahîka Özgür Gündemê bûye, pêk hat. Li gorî vê qerarê derketina rojnameyê bi fîli tê rawestandin û çap û belavkirin bi temamî tê sekinandin.

Li ser rojnameya Özgür Ülkeyê ji derketinê heta girtinê pêkutiyê dewletê nesezinî. Xebatkarê wê hatin kuştin, girtin, binçavkirin û hwd. Di 3'yê berfanbarê (meha 12'ya) de navenda wê û du şubeyen wê (Çağaloğlu, Enqere) hatin bombekirin. Xebatkarê rojnameyê Ersin Yıldız mir, 19 xebatkar jî birîndar bûn. Navend û şube bitemamî xerabûn û şewitîn. Lâ Özgür Ülkeyê dev ji weşanê berneda û weşana xwe bi alikariya rojname û kovarê sosyalist û demokrat domand. Roja 6'ê rîbendanê bi civîna MGK'ê re (Linenya Ewlehiya Neteweyî) bîryarek nû stand. Pişti vê bîryarek dozgeren DGM'ê (Dadgeha Ewleyî ya Dewletê) li çapxaneyê dest danîn ser rojnameyê.

Pişti vê qonaxê rojnameya bisansûr dest pê kir. Û heta roja dawî jî sansûrê dom kir. Sekinandin weşana rojnameyê ji aliye gelek kes û saziyen bîyan ve hate protestokirin.

Serokê Belediye-İş'ê revandin

Serokê sendikaya Belediye-İş'a Elîh (Batman), Osman Küntêş 4'ê reşemiyê ji aliye çend kesan ve hate revandin. Erebeya Küntêş li nêzîkî Xêzxerê hate dîtin.

4'ê reşemiyê, Osman Küntêş, li taşa Kismetê, ji aliye 2 kesen nenas ve hatiye revandin. Li gorî malbata wî, ew li ber mala xwe û bi erebeya meqamî xwe hatiye revandin. Malbata wî: "Me serî li her der û meqamî daye, lê tu agahî der heqê wî de tune ne. Em ji jiyanâ wî endîşeyê dîkin." gotin. Erebeya wî li nêzîkî Xêzxerê li kîleka rî hatiye dîtin.

Elîh/Welatî Me

PEN'a kurd: 'Bes e kurdkuji'

Navenda PEN'a Kurd, li ser şerî birakujiye daxuyaniyeke nivîskî da çapemeniyê. Di daxuyaniya bi navê "Bes e kurdkuji" de dibêjin ku nema dikarin li hemberî şerî kurdkujiye bêdeng bimînin û bêzar in ku rola birayêñ dijmin dilîzin.

PEN'a Kurd bi beyanata xwe ya 25.1.1995'an diyar dike ku ji başûrê welêt mirov ji ber lihevxitina rêxistinê kurd direvin û ev yek rûreşiyek e. Navenda PEN'a Kurd, di dawiya daxuyaniya xwe ya nivîskî de dide zanîn ku ji ber rewşa li başûrê welêt xwe di rewşeye sernizmî û şermezârî de dibînin, her wiha ji vê yekê jî hêzîn serdest ên başûrê Kurdistanê feydeyê dibînin û wan wiha bi nav dîkin: "Fermandarên kurdkuştinê."

Bi rîzîn jîrîn dawî li daxuyaniye tê: "Kî kurdan bikuje nikare xwedîtiyê li kurdan bike û ci roj be jî dîrok wê wan bisizîne (ceza bike). Çekên xwe biavêjin... û seyr bikin we ci li şuna xwe hiştiye."

Navên 10 kesên
ku di xaçepirsa
hejmara 11'an de
peyva veşarî
'Mezrabotan'
dîtine û pirtûka
"Zimanê Çiya"
qezenç kirine

**Mevlüt Polat
İsviçre**

Ayten Eksen
İzmir

**Kemal Karabaş
Çınar/D.Bakır**

Ahmet Yılmaz
D.Beyazıt

**Yusuf Bulut
Almanya**

Ibrahim Cantepe
Buca/Izmir

**B. Şahin
İsviçre**

Seyfettin Kaya
Ankara

**Melike Külli
Mersin**

Zinnar Karaaslan
Mersin

**Birêz Mehmet
Yılmaz**, pirtûka me
ji we re şand li me
vegeriya. Ji kerema
xwe li me bigere.

Xaçepirsa me bixelat e. Di
15 rojan de ci bersiv bigi-
hîjin me, em dinirxîn.
Xelat bi usûla qurayê li deh
kesan têr belavkirin.

**Xelata vê heftiyê pirtûka
Dostoyevski**

"Şeşen Spi" ye.

Ev pirtûk ji aliyê Firat
Cewerî ve li kurdî hatiye
wergerandin.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we
bê nirxandin, divê hûn
"Peyva Veşarî" di nava
qutiyen li bin xaçepirse
binivîsinin û tevî adresa
xwe ji me re bişînin.

AGAHİYÊN ABONETIYÊ**Min Welatê Me divê**

	Li Hundir	Li Derve
<input type="checkbox"/> 3 Meh	<input type="checkbox"/> 400.000 TL	<input type="checkbox"/> 35 DM
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 800.000 TL	<input type="checkbox"/> 70 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.600.000 TL	<input type="checkbox"/> 140 DM

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkîyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264-1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :
NAVNIŞAN :

Navnişana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/İST.
Tel-Fax: 2491344 – 245 29 91

Ji çapemeniya tirk pêniwîseke cihêreng: Çetin Altan


Sabiqedarê kronik ê perçiqandina 'mafê mirovan': Tirkîye

*E*n nivîs heftiya çûyî di
rojnameya Sabahê de
ji aliyê Çetin Altan
ve hate nivîsandin. Altan
bi dîtinê xwe yê
cihêreng ji nivîskarê tirk
êni nijadperest vediqete.
Me jî pêwist dît ku vê
nivîsa wî pêşkêşî xwendevanê
xwe bikin.

Nasnameya me gişan
di çavê dinyayê de bi
mohreke ku nayê dîtin a
zalimtiyê hatiye demxe
kirin.

Tirkbûn hema nemaye
ku bibe hevwateya
peyva "zalimbûn"ê.

Osmaniyan nîjada
tirk mîna nîjadeke bin
sewiye (kêm rûmet) di-
dîtin. Lewma jî pêvajoya
sedan salan nehiştin
ku kesekî bi eslê xwe
tirk têkeve nav artêşa
(ordiya) "Yeniçeriyan".
Li gorî Osmaniyan tirk
kesen fêmkor bûn. Ji ber
wê yekê di zimanê Os-
maniyan de tarîfeke wi-
ha hebû ji bo tirkan: "Et-
rak bê-îdrak."

**Nivîskar û rojnamevan Çetin Altan**

Wekî din dîsa li gorî
Osmaniyan: "Hişê tirk
kan an dema ku direvin
an jî di dema destmêja
mezin de ku inteintê di-
kin, tê serê wan." Ji bo
tirkan biwêjeke din a
Osmaniyan jî ev bû:
"Begîti (mîrîti) dane tirk-
ko, pêşî bavê xwe dale-
qandiye."

Şairê mezin ê Osmani
Nefî li ser tirkan ev mis-
re nivîsandibû: "Türke
hak çeşme-i irfan haram
etmiştir." (Xwedê jî tirk-
an re kaniya irfanê he-
ram kiriye.)

Gelo hûn dizanin he-
gareta dawî a Nefî ji bo
Mehemed Çawişê Stûx-
war –dû re bûye wezîrê
ezam- ê ku ji bo xeni-
qandinê wî dibe êzinge-
ha serayê ci bû ye? "De
here ji wê derê bre tirkê
cahil."

Ew şairê ku mîna
mîtralyoza dijmîn û xe-
berên giran bû, beriya
ku nefesa xwe ya dawî
bide ji wê girantir gotin
nedîtibû ji bo ku ji cel-
ladê xwe re bibeje.

Li wan salênu ku ez
mebûs bûm, keçika min

şes salî bû û hê dest bi
mektebê nekiribû.

Wê demê kurikê O.
Koloğlu Sînayê delalok
diçû sinifa yekemin a
dibistana seretayî. Sîna
keçika min Zeyneb jî da-
wet kiribû ji bo şahiya
dawiya mektebê.

Di wê şevê de Zeyne-
ba biçük ji lîstik û
xwepêşdanê zarokên ta-
xa xwe hesidibû û ji ma-
mosteyekî nas xwestibû
ku bihêle ew jî şîrekê di
şevê de bixwîne. Ma-
mosteyê nas ew dabû
ber milê xwe, kincikekî
sor li serê wê girê dabû
û derxistibû ser se-
neyê, pêşîya temaşeva-
nan. Zeyneba me ya şes
salî jî şîreke ku bi van
rézan dest pê dikir,
xwendibû.

"Ez rêzik rêzik morî
me

Di bedewiyê de bêno-
li me."

Yanê wê şîreke zaro-
kan xwendibû. Lê werin
li vê ecêba giran binérin



ku di nava temaşevan
de manav (fêkîfiroş) û
mihendisek rabûne tele-
fonî Emniyetê kirine û
gotine keça Çetin Altan
propagandaya komu-
nîzmê dike. Li ser telefo-
na wan polîs hatibûn
keçika min a şes salî bi-
ribûn qereqolê û jê pirsî-
bûn ka çima wê kincikê
sor li serê xwe girêdaye:

Ez hingê li Enqereyê
bûm. Min çawa xeber
bihîst, min lê da bi bale-
firê hatim Stenbolê. De-
ma ez gihamê malê Zey-
neb berdabûn li şoka wê
xewnereşkê hê ji ser xwe
neavêtibû.

Dinyaya medenî niha
iktîdarên tirk hinekî din
jî zêdetir bi zalimtiyê
gunehkar dike.

Em bûne lekeyeke reş
a mirovahiyê, ez niza-
nim çima em hewl na-
din ji bo ku em xwe ji vê
lekeya reş xelas bikin.

Wergê:
Mazhar Günbat

Xelata Xaçepirsê**"Şeşen Spi"
Dostoyevski****X A Ç E P I R S A B I X E L A T**

PEYVA VEŞARÎ

WELATÊ ME

1 2 3 4 5 6 7

DIK



Jamaica stranbêj Marley bi bîr tîne

Salvegera 50'mîn ya jidaykûna stranbêjê bi nav û deng Bob Marley, li Jamaicayê bi awayekî fermî tê pîrozkirin. walîyê Giştî Howard Cook bi civîneke çapemeyî "Roja Bob Marley" ilan kir. Cook, di civînê de wiha got: "Marley mirovper-werekî mezîn bû. Wî bi mesajên di çavêن xwe û stranêن xwe de, rastî, başî û pîrozî digihand mirovan." Marley sala 1981'an di 36 saliya xwe de ji ber nexweşîna şerpenceyê (qanser) miribû. Biranîna wî heta îsal bi destê derdorêni müzikperwer û civata Rastafarî çê dibû. Îsal ji bo bîranîna wî pulen taybet, pereyêن taybet têن çapkirin. Ji xeynî wan konserêni müzikê û konferansên li ser muzîka wî "Reggae", Rastafarîyan û çanda Jamaicayê li dar dikevin.

Di van rojêni dawiyê de mij û dûx-anek, teşqeleyeke mezin ketiye nava Tirkiyeyê. Du partiyên tewş dikin bi hev re yekbûnê pêk bînin. Navê vê yekîtiyê jî danîne: "Yekîtiya Çepgirêni Tirkiyeyê". Ax û waxa sosyaldemokratan(I) e. Dibêjin: "Çima Bülent Ecevit jî tevî vê yekîtiyê nabe." Nizanim ci agir bi nivîskarêni "rastgir" ketiye. Radibin, rûdinin dibêjin: "Ka çima çepgirêni me nabin yek?"

Hûn çepgiriya Ecevit li wê derê bihêlin, gelo SHP û CHP çiqas çepgir in. Bêşik di nava rêvebirêñ herdu partiyâni de yên ku wateya çepgirêñ dizanîn û haya wan ji ilmê marksîzmê heye kêm bin jî, hene. Di nava endam û dilxwazêñ herdu partiyâni de sosyaldemokraten rastî û jidil ne kêm in.

Belê, ma ev bes-e?

Tîştek qenc nayê zanîn.

Partî, bi rîbaz û bernameyêñ xwe; bi serokatiya xwe û bi kirinêñ xwe têñ nirxandin.

Li Çeçenîstanê şerê qirêj

Piştî ku Rûsyayê Serkeftina xwe ya li hemberî hêzên çeçen îlan kir, roja 7'ê rîbendanê ajansa Itar Tassê daxuyaniyeke Wezîriya Karê Parêziyê ya Rûsyayê weşand. Li gorî vê daxuyaniyê wê Rûsyâ hêzên leşkerî ji Çeçenîstanê bikişine. Li hemberî hêzên çeçen wê tenê hêzên girêdayî wezîriya karê hundirîn bimîn. Li dijî van gotinêñ

rayedarêñ rûs ajansêñ navneteweyî didin zanîn ku hîn gelek derêñ bajarê Grozniyê di bin kontrola hêzên Çeçen de ne. Li gorî agahiyêñ ajansan hêzên rûsî li Çeçenîstanê dest bi şerê qirêjî kirine. Kovara Newsweek'ê di hejmara xwe ya dawîn de ya 13'ê reşemiyê dide zanîn ku li îstasyoneke nezî Mozdokê bi sedan mirovîn çeçen û rûsêñ xwechî hatine civandin û ji leşkerêñ rûs zilmê dibînîn. Li gorî nûçeya eynî kovarê hêzên rûsî li çeçenînan işkencyeyen cur be cur dikin. Gelek mirovîn çeçen dibêjîn ku leşkerêñ rûs li wan dane, bi metodêñ hov işkence li wan kirine. Jê tê tîrsîn ku nexweşîyê wekî kolera û vebayê li nava gelê Çeçenîstanê belav biben.

Nûçeyêñ Derve



Li Fransayê grev û boykot

Xwendekar û ma-mostayêñ fransiz li dijî politikayêñ hikûmetê roja 8'ê reşemiyê neçûn dibistanê.

Greva bi sedhezaran mamosteyêñ dibistanêñ dewletê, bi piştgirîya xwendekaran xurttir bû. Armanca vê livbaziyê wekî; başkirina rewşa dibistanan, zêdekirina meaşen xebatkaran û zêdekirina imkanen kar hate diyarkirin.

Li navenda Parîsê bi

Nûçeyêñ Derve

Gerîla daketin nava bajêr

Li Srî Lankayê gerîlayen Tamîlân pişti serrawestandinê ji daristanan derketin, hata nava gel. Şerê "Pilingen Rizgariyê yê Tamîl Elamê" yê ji bo weletekî serbixwe, pişti li-hevrûniştinê aştiyê roja 8'ê rîbendanê rawestiyan bû. Li herêma Batticaloa

Nûçeyêñ Derve




Ser ji bo ewleyiya başûrê Parzemînê Amerîkayê wekî tehdîdekê tê dîtin.

wan wargehêñ Ceuvas de los Tayos û Base Sur bi dest xistine û dor li wargehê (kamp) Tiwizin jî girtine, di demeke kurt de wê ev der jî bikeve destê wan. Serokê Ekvatorê Siksto Duran Ballen ev idia red kiribû û gotibû ku, hêzên Perûyê tû der bi dest nextiline. Bi awayê ku Fujimori

daxuyandiye, heta niha di şer de 26 leşkerêñ Perûyê hatine kuştin, du ji helikopterên wan ketine. Wezîre Karê Parêziyê yê Ekvatorê Jose Gallardo got ku heta niha 11 leşkerên wan hatine kuştin, 2 leşker winda bûne û 26 leşker jî di şer de birîdar bûne.

Nûçeyêñ Derve



REWŞA DINAYÊ

OSMAN ÖZCELİK

Sosyaldemokraten derewîn

Ka di van herdu partiyâni de, serokatî, bernâme û kirin-çi ne? Tu şopêñ sosyaldemokrasiyê tê de hene? Mirovîn sosyaldemokrasiyê dinasin, zanîn ku sosyaldemokrasî û ev partî ji hevdû gelek dûr in. Mixabin, li weletekî ku çepgirî li ser ilmê marksîzmê bilind nebûbe û di nava xwedîyêñ xwezayî de belav nebûbe, çepgirêñ derewîn derdi Kevin qada siyasetê û bi milyonan mirovan li dû xwe kaş dikin. Heta ku rûpûşa (maske) wan ji ser rûyêñ wan bikeve.

Têkoşîna gelê kurd gelek rûpûş xistine. Ev şerpezebûna sosyaldemokraten derewîn wê bidome, ta ku wekî Ecevit dest ji sosyaldemokrasiyê berdin û ya rast bibêjin: "Em nijadperest in", ango vegeerin ser eslê xwe. Wekî tê zanîn esl û feslê wan ji CHP' ya M. Kemal û İsmet İnönü tê. Ew jî ji İttihat-Terakkiyê tê, ku bê tevdayîn wê bêhna xwînê were bêvila mirovan. Dek û dolabêñ bapîrêñ wan qet têñ jibîrkirin? Di dema yekpartiyê de tiştîn ku

M. Kemal û İsmet İnönü anîne serê kurdan, dijminan ne anîne serê dijminan. Ên serokê komünîstên tîrkan, Mustafa Suphi û hevalên wî di Behra Reş de fetisandin kî bûn? Li ser navê laîsîzmê kê bêhna misilmanan çikand, kê laîsîzm xesand? Di Şerê Koçgirî, Agirî, Şêx Seîd û di Dersimê de hukim di desten CHP'ê ya M. Kemal de bû, xwîn herikî... Di qirkirina Maraşê de CHP'ê ya B. Ecevit li ser hukim bû, xwîn herikî...

Li Sêwazê 37 rewşenbîr hatin şewîtandin, ciya û gündêñ Kurdistanê dişewitin, SHP şîrîkê koalisyonê ye. Na birano, nal... Nema kes bi we dixape. Kurdan dest ji we kişand, man elewî... elewî jî roj bi roj ji we vediqetin. Hûnê bimîn bi serê xwe. Yekbûna we, we xelas nake. Herkes dizane yekbûna we ji bo şîrîkatiya dizînê ye. Hûn û bapîrêñ we, hûnê di ronahiya pêşerojê de bîhelin. Dîroka gelan tu caran we efû nake.

F A L



BERAN

(21 Adar - 20 Avrîl)

Zimanîna we wekî aveke zelal e. Di hişê we de armançeke nû heye. Wê armancê ji bo doza gelê xwe a-made bikin. Dev ji tirşikçitîyê berdin, ji hevalên xwe yên nû hez bikin.



GA

(21 Avrîl - 21 Gulan)

Herdem hûn dibejin: "Ez baş im!" Gelo ew kesen ku we nas dîkin jî vî tiştî dibejin? Xeberdana zimanê xwe rast bikin û destê xwe jî nexin nav karên kesen din ên ku hûn nas nakin.



CEWÎ

(22 Gulan - 21 Pûşper)

Roja we ya ku hûn jê hez dîkin şemî ye. Hûn bi çar çavan li benda wê rojê ne. ji bo ku hûn pir rakevin. Ev ci halê we ye? Hûn li kesî guhdariyê nakin. Problemeke we ya giştî hebe, bi hevalên xwe re bikevin têkiliyê



KEVJAL

(22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Çare ew e ku hûn li ser doza xwe bifikirin û wê dozê bidominin. Çiqas hûn bibejin: "Ez di tengasiyê de me jî." Bizanibin ku xwendin jî bi pereyan e. Wê ji we re; ji cîhekî dûr perewin, eger ku şandibin.



ŞER

(24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Çavên we çiqas li derive bin jî, hişê we hertim li hûndir e, serê xwe ji ser balgiyê xwe bilind bikin, bimeyzînin ka li derûdorêne we ci dibe. Li gorî stêrka azadiyê rojên nû li pêsiya we heye.



SIMBIL

(24 Gelawêj - 23 Rezber).

Hêviya we ji tiştîkî hebû wî jî xwe gihande we. Di karê xwe yê nû de hûnê serfiraz bibin, rojên cihêreg li pêsiya we hene. Ji bo wan rojan xwe baş amade bikin. Destengiya we wê xelas bibe.



MÊZİN

(24 Rezber - 23 Kewçêr)

Kar û barê xwe bikin, riyekê dûr li pêsiya we heye. Li berîka xwe xwedî derkevin, bi şevê pir negerin. Ji bo aboriya we pêwîst e ku hûn karê xwe bidominin. Dev ji serhişkiyê berdin.



DÜPIŞ

(24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Gelek kes ku we dibînin jî we ditîrsin, lê halekî we yê wişa tune. Hûn jî dev ji serhişkiyê berdin, hinekî rûnerm bin. Ew tiştîn ku hûn dixwazin jî wê ji we re werin



KEVAN

(23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Hûn dexwazin ku hertim serfiraz bin, serfirazbûn baş e, lê divê hûn sistêma xwe biguherin. Eger hûn bi wî awa yî herin, tu caran hûn nikarin tiştîkî baş ava bikin. Ew pirtûka ku hûn dixwînin, careke din bixwînin



HARIK

(22 Berfanbar - 20 Nîbendan)

Bipashveçün hûn jî dizanîn ku ne baş e û dixwazin bi pêş ve herin. Pêşveçün jî bi xwendinê dibe. Hinek kes wê ji bo karekî bêna ba we, zêde jî xwe desteng nedîn nîşandan.



DEWLIK

(21 Nîbendan - 11 Reşemî)

Çiya çiqas nezikî we bin, bajar jî ewqas nezikî we ne. Di navbera herduyan de qerarekê bidin. Di navbera du tiştan de nemînin. Xeberên xweşik wê ji we re werin, nexweşîyeke sivik hûnê derbas bikin



MASÎ

(20 Reşemî - 20 Adar)

Ronahî di jiyana we de her tim bûye nîşangehek, berê xwe bidin wê ronahîyê û bimeşin. Dev ji xwendin û nîvîskariyê jî bernedin. Bi xwendinê hûn nabin nîvîskar jî, qet nebe hûnê jî nîvîskariyê fêm bikin.

Min navê wan nîvîsîn qumandarim

Li herêma Botanê dîsa rojekê ji rojên mîna her rojê, leşkerên tirk tevî qumandarê xwe derdikevin operasyonê. Ci Gundê ku dikarin herinê diçin û gundiyan li qada gund kom dîkin. Temamê hovitiya xwe li ser wan pêk tînin. Dema ku ji lêdana wan, diwestin çend kesen ku awirê wan naecibînin bi xwe re dibin qereqolê û li wir işkençeyê li wan dîkin; mîna feleqeyê, dana ceyranê û da-laqandina Filistînî. Gundiyekê kal(ixtiyar) heye pir melûl e, bêtaqat e û li ber vê işkençeyê debar nake û ji bilî wê ji gotinê qumandar ên ku dibêje:

"Hûn destgiriya teroristan dîkin, hûn tev terorist in, ermen in, pir li zora gun-diyê reben diçin. Bes tiştek jî destê wî nayê û he-wara xwe digihêjîne şêx û mişayixan û dibêje;" Ya Şêx Seyda, ya Şêx Reşîd, ya Şêx Evdilqadîrê Gêlânî." Dema ku wisa dibêje, Jendermeyek di beze cem qumandar û dibêje: "Komutanım, komutanım adam çözüldü." (Quman-darê min, qumandarê min mîrik peyivî) Quman-dar, "Ne dedi? (ci got?) Jendirme," İsimlerini yaz-dıım komutanım. (Min navê wan nîvîsand qu-mandarê min) Quman-dar, "Arabayı getirin köye gidelim." (Terembêlê bî-nin em biçin gund.) Qu-mandar û jendirmeyê xwe diçin gund û gundiyan di-din hev û dibêjin:" Kesen em navê wan bixwînin bi-la deren pêş." Bi dengekê bilind bang dike:" Şêx Seyda, Şêx Reşîd, Şêx Ev-dilqadîr... Gundî hem di-tîrsin û hem dikenin. Bi send sond û qesemî baweri-riya qumandar tînin ku kesen navê wan hatin xwendin beriya sedsalan wefat kirine û ew kes şêx û mişayix in. Bi navê wan kesan sond tên xwarin. Qumandar piş re, bi dile-kî kul û pozekî şikestî ve-digere qereqola xwe.

ZİWER ÖZKAŞ



Diayê bi kurdî

Li navçeya Silopiye du mele hebûn. Yekî ji wan tiştîn rast jî gel re digotin, yê din gelek tiştîn ku nizanibû jî tev li hev dikirin.

Rojekê yekî gundî diçe ji seydayê me dipirse: "Seyda welle meleyê din li ser vê pirsa min got ku bi

dî dia dibin an na?"

Seydayê me yî nezan dibêje: "Na welle bi kurdî dia qebûl nabin. Divê bi e-rebî hûn diayan bikin."

Gundiyê me radibe diçe ma meleyê din. Dibêje: "Seyda welle meleyê din li ser vê pirsa min got ku bi

kurdî dia nabin, rast e an derew e?" Seydayê me yî delal hêdîka dibêje: "Rabe biçe ba wî melayî, jê re bibêje: "Ez bi kurdî di diya te..." tê bibînî bê ka bi kur-dî dia qebûl dibin an na."

Mamoste
BEDRAN BÊNAV

Qur'ana bi kurdî

Cend heval em rûniştî bûn. Em mijûl di-bûn. Hevalekî got: "Min bihîstiye ku Qur'an wergerandinê zimanê kurdî". Hemû hevalan tev ev kirin wekî tiştîkî baş dîtin. Lê ji wan heva-

lan mamosteyekî tirk got: "Towbe, towbe! Tiştîkî wiha ne rast e." Hevalan jê pirsîn: "Çima ne rast e mamoste?"

Mamosteyekî tirk got: "Bi tirkî be, bi îngilîzî, yewna-nî be, bi frensî be baş e, hema bi kurdî tenê fahş e ne wisa mamoste?"

Mamoste
BEDRAN BÊNAV

Wêne:
R. MARO



MIN DÛJMINÎ BIRAKÛJ IM

**Esteş hîwam ewe
ye, nûseran, şâîran
û roşinbiran ewey
le destyan dê
biken, bo ewey
yekem: Hîç nebê
çek damaldirê le
Kurdistan, le sayey
çek da nageyne hîç,
hîç helêk mumkîn
niye. Kongirey
niştimanî delên,
perleman delên,
herçî helîdebjîrin
le sayey çek da
heldebjêdirêt,
çekîş hukmî
gewretire le wişe
û bîrkirdinewe."**

Abdullah Peşew, le katî xoy da be hel-wêste şîr dengî helbirî û witî:

Min dûjminî birakûj im

Bêşerefanetirîn şer, şerî birakûjî ye

Namerdanetirîn şer, şerî birakûjî ye...

Şâîrî nasrawman Abdullahe Peşew rojî

07.08.1994 le şarî Hewlêr û le germey rûdawekan da, be karêkî şîîrî helwêstî xoy bo hemwan aşkira kirdû bem core desî be qisan kird:

"Zor bextewer im em roke le ber demtan da biwestim û xom be şermezar nezanîm, ewey pême zor keme, renge her lewe biçê ke şîwanêkî hejarî reş û rût û qûti kurd le tiwêse berekey dadenê û deybate ber berxan ya ber meran. Lewe ziyatir im pê niye. Belam le gel ewey da tikatan lê dekem çawa-rey şîr meken, ewey pême pêş ewey şîr bê, helwêste... Min, be diway helwêst da gera-wim, pêş ewey be diway wirde karî û şîr a biggerêm, demewê ewey le dilim daye be zimanêkî sûk û sade, be zimanêkî ta detwanim rewan, be reş û rûtî mîletekemî rabigeyenim,

bo ewey le şîîrî birakuji bigen.. Bo ewey le şîre-kanim bigen ke hendêkyan em ro dêxwênimewe, be pêwîstî dezanim hîç nebê le xeyalî xotan da etlesî şerî birakuji, etlesî sî saley birakuji bihêne ber çawî xotan, her le salî 1964 ta em ro, biza-nin ême ci aşêkman bo xwêni xoman danawe, bo xwênanman ci aşêk de-gerê! Wa têdegem birakuji le saykolojiyetî birakujiye we hatûwe, saykolojiyetî mirovî zelîl, kam le ême zelîl niye?!


Serkirdekanman nimûney zelîlî mîletî êmen, ewe temâşaken eger hemû Kurdistan be pîrya-newe biçê be qed mü-yek, be qed serî derzi-ye, karyan tênakat! Belam yek fikey dagirkarî Kurdistan bê, yek ser boy deçin, hey pêy lêde-ken û deçin...

Min dûjminî birakûj im.. Dûjminî babekûstey

birakuji büyim û dûjmi-nî babekûstey birakujiş debim. Mûmkîn niye be hîç şêweyek her mi-rovêk xoy be kurd bi-zanê, be tek em xak û welatewe bê, be hîç şêweyek nabê tebrîri birakuji bikat. Birakuji xi-yaney e, bêşerefanetirîn şer, şerî birakuji ye. Namerdanetirîn şer, şerî birakuji ye.

Rojêk birayekî serkir-dayeti hîzb (partêk) bo xelkî Hewlêrî birîndar qisey dekird, deygût: "Ewe her lay ême niye, ew şerî birakuji ye le Amrikaş heye, le Ingil-tères heye, le Ferensaş heye." Ey aferîn xwêndewarekey le Aw-rûpa gerawê! Çak le mîjûy Ewrûpa geyisti.

Hemû layek delên aş-tîman dewê, herçî debî-nim delê aş-tîman de wê, belam hîwadar im êweş wekû min bawer be hîç-yan neken. Le telefizyon da delên aş-tîman dewê,



Abdullah Peşew

le binewe çek û tifaq denêrin. Le serewe delên şer ragin, le binewe delên lêdene, ewe si-yasetî birakuji ye.


Esteş hîwam ewe ye, nûseran, şâîran û roşinbiran ewey le destyan dê biken, bo ewey yekem: Hîç nebê çek da-maldirê le Kurdistan, le

sayey çek da nageyne hîç, hîç helêk mumkîn niye. Kongirey niştimanî delên, perleman delên, herçî helîdebjîrin le sayey çek da heldebjêdirêt, çekîş hukmî gewretire le wişe û bîrkirdinewe."

**Amadekar:
SÎRWAN REŞİD**

Çîroknivîsê kurd Evdilhelîm Yûsif ê "ji Amûda şewitî"

EZ LAWÊ DU HEZAR Ü



Hepveyvîn:
Jan Dost

Z

imanek

**û du ziman têra
min nakin. Yek
ji xweziyên min
en veşartî ev e
ku ez karibim bi
hemû zimanan
bikim hewar.
Nizanim çima ev
tin û kela di dilê
min de hênik
nabe. Kulên me
ji cihanê mezin-
tir in. Ziman tev
têra axînên me
nakin. Tiştên ku
ez nikarim bi
kurdî bibêjim ez
bi erebî dibêjim
û carinan xwezî
di qirika min de
dimîne; ne bi
erebî ne jî bi
kurdî der-
nakeve. Mînak:**

**"Helebçe". Li
ber pênc hezar
laş wê pênuş çi
bêje? Li hemberî
mejîyê zarokekî
kurd ku li ser
dîwarekî li
Nisêbînê belav
dibe. Torevan
wê bi çi zimanî
karibe binivîse?**

Ebdul Helîm Yûsif, te bi çirokên xwe li deriyê her xwendevanekî/e xwe xist, içar jî heqê me ye em bipirsin tu kî yî?

- Ez lawê duhezar û şeşsed sal ji tozê me. Bavê min ji gundê 'Herbê' ye -li Kurdistana bâkur- ji berî pêncî salî berê xwe da binxetê û qîrktaliya xwe bi xwe re daxist. Pişti zewaca wî bi diya min re ya ji gundê 'Xirbe Xezal' li binxetê, hinekî li 'Nicim', hinekî li 'Herem Reş' bi cih bûn, heta dawiyê li 'Amûdê' mal ava kirin û dara mana xwe di axa wê de çandin. Di şest û heftan de ez li 'Amûdê' hatim dînayê û ez û dara tû yê ya li hewşê bi hev re mezin dibûn. Tû û kul û pelêner û eş û kevirêni ciyayêni Omeriyan tev bi hev re bi ser serê zarokîya min de diweşîyan, min serxet tev di qelsên destê bavê xwe didît. Binxetê jî di hêsrêni diya min de avjeniya mirinê dikir. Her wiha gelek carî min zikê asoyan diqe-laşt û min eşen xwe li ser 'xetê' radixistin û dema trênen tê vê 'xetê' dike piçik û parî, wekî hestiyekî hûr dike. Ev bîst û heft sal in ku ez li hêviya wê rojê me ku bavê min i serxeti û diya min a binxetê bigihîn hevdu û ev 'xet' bibe duhezar û şeşsed hestiyê hûr di qirika zemên de.

Zimanê erebî hespek bû, te beza xwe li ser kir. Niha tu li ser hespekî kurdî dibezi, gelo tu ji cirîda nav siwarêne reb westiyayî, yan ci...?

- Na! Ez newestiya me û ez ranawestim. Zimanek û du ziman têra min nakin. Yek ji xweziyên min en veşartî ev e ku ez karibim bi hemû zimanan bikim hewar. Nizanim çima ev tin û kela di dilê min de hênik nabe. Kulên me ji cihanê mezintir in. Ziman tev têra axînên me nakin. Tiştên ku ez nikarim bi kurdî bibêjim ez bi erebî dibêjim û carinan xwezî di qirika min de dimîne; ne bi erebî ne jî bi kurdî dernakeve. Mînak: "Helebçe". Li ber pênc hezar laş wê pênuş çi bibêje? Li hemberî mejîyê zarokekî kurd ku li ser dîwarekî li Nisêbînê belav dibe, to-

revan wê bi çi zimanî karibe binivise? Cirîda min bi mirinê re ye, bi tirsê re ye. Ez ditirsim ku ez bimirim û gor jî li min teng bibe, wekî vî zemanê bêşeref. Ez ditirsim ez bimirim û qijnikê bindesiyyê bi min re herin gorê. Kîjan cara ku ez bi erebî dinivîsinim girêkek kûr di nava min de dimîne, venabe, nahêle. Xweziyên dimînin nayen daqurtandin. Bi rastî tenê zimanê dê dikare canê mirov û hesten wî li ser valahiya pelan biherikîne. Mirov dema bi zimanê xelkê dipeyive tim tayekî reş qurmân zimên girê dide.

Jin... Jin... Di çirokên te de, di goleke tehl de avjeniyê dikan... Tu bi çi dûrbînê li herdulan dineri?

- Jin wek kulmek av e; her ku tu destê xwe lê digiri di nava tiliyên te de diherike û winda dibe. Heta vê kîlîkê tiliyên min tev dilopan dikan. Ne ez karim avê vexwim ne jî desten min ziwa dibin. Dilê min i ewîlî gelek avahî di nava min de hilweşandin. Min ji keskekî ji Amûdê hez kir, lê mîrekî du basken jî zér û peran jê re çêkirin û ew firand "Si'ûdyê". Niha li wir dibin çariyeke reş û ebê de dijî -ew jî ji maleke komunîst bû- vê bû-yera kevin pelekî keskî, bî dara dilê min ve nehîst. Heta niha kîjan bîhara ku bi ser dilê min de hat paýîz bi xwe re dianî. Ez dihestim ku dawiya vê xelekê gêjbûn û windabûn e. Ji pêvî komên ariyê û şewatê tiştek li ser ciyayê dilê min nexuya ye. Her çirokeke min jî parceyeke ji laşê min e, ji xwîna min e. Dema ku jiyanâ mirovîkî talî û zikresî be, wê ev talî zimanê xwe di nava peyvekên çirokên wî de derxîne. Jîn gotineke biyan e. Ez wê xweşik nas nakim. Nayê bîra min ku rojekê tenê bavê min û diya min kîfxwes bûn, tim pevcûn û qerebalix û xirecir li ser serê me bû. Me zarokî nedît. Tê bîra min dema ku éz ji diya xwe ketim, temenê min li dora duhezar salî bûn. Lî jîn ci ye? Xwe li ku veşartiye? Ez dixwazim rojekê bi guhê wê bigirim û wê bikşînim vî er-

dî û tayek por bi serê wê ve nehêlim. Ez ji jînê hez dikim heta mirinê. Ez wê tim di xewnê de dibînim; her carê bi rengekî.

Heta kîjan dereceyê têkiliyên te bi kesen çirokên te re hene? Ci ji te di van kesan de heye?

- Têkiliyên min bi kesen çirokên min re bêşînor in. Her kesek ji wan û têkiliya min pê re, bi rengekî ye. Ez wan li ser kîfa wan dihêlim. Geh ez bi wan karim, geh jî zora min dibin. Lê her tim ew bi zimanê xwe dipeyivin û bi lingên xwe dimeşin û ez jî deriyên çirokan li ber wan vedikim. Ta ku bén ber çavan. Bi hemû pîsbûn û qenciyên wan ez bi hinekan re dibim dost û bi wan re dikenim û digirîm. Hinek jî kezeba min reş dikan. Çirok cîhanek serbixwe ye; deriyê xwe ji her kesî re venake. Divê nivîskar gelek ji rewşen "Xwedê" tê de hebin, heta ku vî derî veke. Hest û rastî tenê ne bes in. Gelek ji zanistîyê jî pêwîst e heta ku nivîsarek xweşik ava bibe. Kesen çirokên min tev nêzîki min in. Gelek carî jî ez xwe di gumlikê yekî ji wan de vedişerim. Ez bi wê çirokê re me ku bi hostayî bê zimên. Anglo çawatiya nivîsandina çirokê ji berî babeta wê ye. Dawî ez dikarim bibêjim tiştekî min di kesen çirokên min de tune ye û hemû tiştên min di wan de ne.


Pir ji kesen çirokên te sax in û te nas dikan, tu jî wan qenc nas dikî, di nivîsandina xwe de te kirase wan ji wan kirîye û tazîbûna wan şanî me didi. Eger tu rû bi rû van kesan bibînî, gelo tê karîbî kirêtiya (qezareta) jiyanâ wan ji wan re bibêjî? Cîma?

- Ez vî tiştî nikarim bikim ji ber ku em tev di nav kirêtiyê (qezaretê) de avjeniyê dikan. Di nêrîna min de mirî û zîndiyê me tev berpirsiyarêne re rewşen. Ez tu kesî ji vê gemarê naşom. Em tev súcdar in. Ev rewşekî gelemperî ye, dû re rola nivîskar hatiye guhertin. Ji min tê xwestin ku ez nivîsareke xweş û paqij bidim xwendevan û ew jî karê min temam dike.



nêrînên xwe yên bikul û cihêregji Welatê Me re anîn zimê:

ŞES SED SAL JI TOZÊ ME



Kesên ku em ji wan re dînîsin ne yek û deh û hezar in. Em hevpeyvînê bi zêdetirî nifşekî re vedikin. Armancêñ me mezentir in ji van çend kesan û dûrtir in ji wan. Mane, te dît çawa zend û benden xwe vemaltin û daketin pêsiya min li Amûdê û ji lêxistin û kuştinê re ji amade bûn. Rastî tim tal e. Min di pirtûka xwe de -mêrê avishtek tenê got. Min kirasen hinekan hilda û got li teriya wan binêrin. Ev kesen bi terî ne, hîn nû gotina min ji devê min ketibû ser kaxetê, hatin ku zimanê min jêkin. Lî pêlén rastiyê tu kerş û gemarê li ber xwe nahêlin. Li mexferê min nas kir ku her sê kesen ku hatin pêsiya min -ji bo nivîsandinê min-nizanîn bixwînin. Erê! Belkî karibin dîwar û darêن xwe dirêb bikin, navbera mirov û her tişten wî û azadiya wî biperçiqin. Lî tu dar û dîwar nikarin têkevin navbera nivîskarekî azad û rûpelên spî.

Amûd warê zarokî û xortina te ye. Amûd a komunist Amûd a sofian... Amûda bohîmyan... Tu ji kîjan Amûdê yî?

- Çawa işe sofiyên Amûdê bi bîhuşte tune ye wisa ji işe komunisten wê bi zanistiyê tune ye. Ji her alî ve felek li serê wê geriyaye. Bajarekî bêxwedî, bêmecal. Di qorziikeke veşartî de ji dînyaya Xwedê hatiye jîbirkirin. Her parçeyek ji laşê min li kêlekeke ji Amûdê belavbûyi ye. Bi sax û miriyên xwe di hişê min de ye. Bajarekî ku mirin tenê wî ji mirinê şiyar dike. Ne zarokî lê heye ne ji xortanî. Zarokî di hişê min de tim girêdayê pêxwasiyê û jêkirina teriyên pisik û ker û kûçikên heftîr bû. Ew dilopeke xwîna ziwa ya bi serê tiliya mezin ya lingê rastê ve û bi goga ji gore û paçikan listin bû. Ew hineki diziya tirî û reva ji ber mezinan û desten wan i pan û lastikî bi şiqamên tûj û xedar bû. Eger ev zarokî be, gelo xortanî ci ye ew bi xwe ne zarok, lê zarok in, ne ji xort, lê xort in. Xorten ku hene ji bi çaralî ve direvin yan ji dibin bav û kalik di sê çar ro-

jan de, yan ji xwe dispîrin mizgeftan. Pîrbûn tenê li Amûdê şahîşah e û konen xwe li ser serê her zarok û xorti vegirtiye. Xelkên wê li du cihan li ser dorê rez dibin. Li ber firûnan ji bo nan û li ber agirê şermola goristanê. Li bendê ne ku seren xwe yî mişt teqereq têxin bin wê axa kevin. Aaaaax. Şermola te ci dît, û te ci nedît. Erê! Ez ji Amûda şewîfî me.

Xwîna Selman Ruşdî ji bo romanekê heder bû, çirokên te ji tu dan ber şûre olperestan. Gelo tu amade yî xwîna te heder bibe ji bo nêrîn û ramanen te? Heta kîjan derecye tu xwe azad dibînî di nêrînên xwe de?

- Xwîna me ji roja roj ve heder bûye. Em kengê bûne xwediyê xwîna xwe heta iro ku em ji kuştinê bitirsin? Ez azad im di nêrînên xwe de heta dawiyê. Tu tiş li dînayê çavên min naşkîne ji ber ku tu tiş tune ku ez li dû xwe bîhêlim û li ser bigirîm. Çawa mirov tazî tê wilo ji tazî diç. Bi rastî ez gîhîştime derecyeke ku her tiş li cem min wekhev e; mirin ji carekê tê, kengî ji hat ezê bi sola xwe pê re bipeyivim. Ez înakar nakim ku ez bi Gelgamiş re giriym, dema ku mar, "gi-hakê manê" jê dizî û xwar. Heta ji min tê ez xwe ji mirina erzan dîparêzim. Lî mirin dimîne weki hevalekî ku xwe ji bin cermê min bernade. Ezê gotina xwe -ji kezebê-bêjîm û kî ci dike bila bike. Ev baweriya min e. Kevnbûna vê babetê ji kevnâna gotinê ye. Ne destpêk Selman Rûşdî ye, ne ji yê dawî ye. Ji roja ku min dest bi nivîsandinê kir min canê xwe xistiye destê xwe û ez dîmeşim ber bi mirina xwe ve. Sermiyanê min ji ev can e. Ezê li ber xwe bidim heta mirinê û ji mirinê re ji, heta ez sax bim, ezê bêjîm "Na!"

Tu dixwazî kesen çirokên xwe bibî ku? Te ci ji bo wan amade kiriye?

- Ez û kesen çirokên xwe tev di nav dûmana dojehê de dikuxin. Bîhuşti di pirtûk û hişen olperestan de ye. Jiyana van kesan bêtir nêzîkî şewitandinê ye. Ev kes bi

pak û pîsên xwe, bi qels û qelewên xwe tev dişewitin di vi agirî de. Cih; ev cih dojehê fireh e û tev tê de diqîçiqin. Qederâ wan wekî ya me reş e. Ev ji ne súcê min e. Tiştekî amadekirî di destê min de tune ye. Tev ber bi agirê xwe ve dimeşin, baz didin û agir bi laş û canen wan hildiperike û wan dike ariyekê. Bayê zeman û bahozên wî, ariyê bela wela dike û di zikê ezmanan de winda dike. Eger bi destê min bûya, min kêvir li ser kêvir nedîhişt. Minê dinya berevajî hevdu bikira. Minê kesen çirokên xwe ji gunehêñ wan biweşandana û her yek du bask ji wan re çebikira ji bo ku bifirin ser şaxen dara jiyanê.

Lî nivîskar xwedayekî bêhêz e.

Ji der vi valahiya rûpelan

Xwedayek nikare tu tişti biguhere

Rengên reş û spî di çirokên te de bi hev re şer dikin. Ma destê te di vi şerî de heye? Ango tu alikariya rengekî li dijî rengekî din dikî?! Yan wekî tu dibînî tu dînîvîsî?

- Di baweriya min de ev şerî wilo paqij tune ye. Şerî di jiyanê de ne di navbera reş û spî tenê de ye. Na. Şerekî tevlihev e, reng ji pir in. Rola min di çirokê de li gorî nêrînên min ên hunerî bi kar tê, bêyî ku ez li kêleka tu rengî bisekinim. Lî rola min di jiyanê de tiştekî din e. Ez bi hemû hêza xwe li kêleka zanistî û ronahiyê disekekinim. Li dijî reşayî û zordariya bêrûmet. Di nivîsandinê de çavê sisêyan ji min re giring e. Mirov normal du çavê wî hene. Lî nivîskar divê sê çavê wî hebin. Bi wî çavê xwe yê sisêyan ez li dora xwe dinêrim û dînîvîsim.

Jiyan wekî çirokekê ye, lê hîn dawî nehatiye, eger dawî di dest te de be, tê çawa deynî?

- Xuyâ ye ku dawî ji vê çirokê re nîn e. Lî eger bi yi rengê çewt berdewam bibe ez dibêjîm ku dawîya wê bê çetir e. Pişti bîst sedsalen dirêj ji medeniyetê hin qanûnen lawiran li cihanê bi kar tê. Hîn hêz hemû tiş e.

Hîn hêz û maf yet in. Hîn masiyê mezin yê biçuk dixwe. Hîn kesen bêpişt -wekî me- li histek erd digerin. Da ku ala mirovatiya xwe tê de biçikînin û çenabe. Wêneyê mirov -pişti van hezarên salan- hîn xwîn jê diherike. Ev ci rewş e, bila xelk spasiya Xwedê bikin ku tu bombevê nitronî di destê min de tune ne ku ez her gavekê bombayekê biçinim ji bo gihakî tenê şîn neyê li ser rûyê erdê. Yan divê mirovayetî hebe yan ji mirov tune be çetir e.

Tu di bersiva xwe de, wekî Xwedayê cihûyan Yahowa xuya dikî. Ewqas dilhişkî û agir ji devê te dibare. Gelo ci ma te ev gir û kîn ji mirovan girtiye, ci bi te kîrine û tu ci ji wan dixwazî?!

- Gir û kîna min li ser her tişti ye. Ji ber ku tiştekî bêsûc tune, di vê dîliya me de. Ez ji wekî mirovokî kuştî dipeyivim. Mirovokî xemgîn heta mirinê, mirovokî ku bi dest û diranan ala paqijî û şaristaniyê hildide û ji pêvî gemarî li dora dilê wî kom nabe. Avabûna cîhanekî din ji di xerakirina vê cîhanê de ye. Divê ev mirov bi agir bên şûştin heta ku em karibin bêkuştin, bêlêdan û nijadperestî bi hev re bijin. Ez dixwazim berê te bidim sedemên ku dihêlin mirovokî wekî min -ku ji jiyanê hez dike bi hemû hêza xwevan gotinê hişk bibêje. Gelo ci dihêle ku gir û kîna mirov şîn bibe; zêde bibe û dihêle ku bibe dijminê herkesi û li çaralî a-gir bibarîne û heta bibe dijminê xwe ji? Dema ez biçuk bûm diya min tim gotinek digot: "Lawo mîrxas heyfa xwe di zikê maran de nahêle." Dora min ji tişî mar in û ez naxwazim gotina dayika xwe li erdê xim û ev çewti û qirêja ku ez nikaribim di jiyanê de xera bikim, ezê li ser rûyê spî bi pênûsê xera bikim. Werîsê kîna min ji dirêêje. Dest pê dike ji dema ku ez ne bi destê we hatim vê cîhanê, heta vê kîlîka ku ez tê de dişewitim bêçare û ber bi gorê ve diçim deqe bi deqe.

'Em bêpeyman destûra xeta petrolê nadin'

Nûnerê ERNK'ê yê Ewrûpayê roja 4'ê reşemiyê daxuyaniyek ji ajansan re şand. Di daxuyanî de ev dîtin cih digirin:

"Van rojên dawî ji bo ku petrol û gaza Kazakistan û Azerbeycanê bi xeta boriyekê bigîhe Behraspi, dewlet û şirkêtê cur be cur bi hev re gengeşî û peymanan çedikin. İro li Kurdistanê di navbera Komara Tirk û Tevgera Rizgariya Kurdistanê de şerek didome. Komara Tirk li ser gelê kurd şerekî gemarî û bêqayîde dimeşîne. Gelê kurd li hemberî vî şerî ji bo mafêñ xwe yên neteweyî liberxwedana xwe ya birûmet didomîne. Di vî şerê de PKK aliyeji şer e. İro li Kurdistanê ixtidareke dualî heye. PKK cihêñ ku K.T. (Komara Tirk) jê vedi-kişe dadigire û otorîteya xwe li wir serdest dike.

Rewşa Kurdistanê iro li herêman bi sê awayan e.

1- Herêmên bi temamî di bin kontrola artêşa me ARGK'ê de,

2- Herêmên ku temamî ne di bin kontrola herdu aliyan de ne jî.

3-Herêmên dibin kontrola hêzên Komara Tirk de. (Bi giranî bajar)

Bi me re peyman çenebe em musadeya xeta boriya petrolê nadin. Gerek e dewlet û şirkêt bi me re têkiliyan deynin û peymanê imze bikin. Beyî otorîteya iradeya gelê kurd û PKK, ERNK, ARGK'ê tu tekel û şirkêt nikarin li

Kurdistanê kar li dar xin. Tewra me têzanîn û vekiriye. Em bala dewlet û şirkêtê navneteweyî dikişin ser vê yekê.

Pirsgirêkîn ku pişt re derkevin pêsiya wan em jê ne mesûl in. Em ji vêga ve tewra xwe didin xuyan."

Kurd-A



Di şerê navbera hêzên dewletê û gerîlayen ARGK'ê de meha borî jî gelek xwîn rijiya

TENÊ LI BOTANÊ DI 30 ROJAN DE 161 KES MIRIN

Vê hefteyê dîsa şer ji dijwarbûna xwe tiştek winda nekir. Li gelek deveran di navber gerîlayan û leşkeran şer derket. Dîsa gelek gundiyan ji pêkutiyê dewletê para xwe standin, Gelek gund hatin valakirin û şewitandin.

Li gorî agahiyênu ku Kurd-A'yê ji Fermandariya Leşkerî ya ARGK'ê ya Eyaleta Botanê stan-dine, di meha rîbendanê de di navbera hêzên dewletê û hêzên ARGK'ê de li gelek derwan şerê mezin û dijwar derketine.

Dîsa Kurd-A bi medide zanîn ku, 1- Li Botanê di meha rîbendanê de li 56 deveran livbaziyan gerîlayan çêbûne. Di van livbaziyan de 69 leşker hatine kuştin ji wan 11 leşker serbaz in.

52 leşker û 2 serbaz birîndar bûne. Wekî din di livbaziyan de 49 cerdevan hatine kuştin, 24 jî birîndar bûne. Di eynî mehî de 7 "kontra" hatine kuştin. Di van bûyeran de 29 jî gerîla mirine û 7 jî birîndar bûne. Li gorî van agahiyâni di livbaziyan de hêzên ARGK'ê 7 keleşkof, 5 tifing, 2 G-3, 1200 guleyên G-3'ê, û gelek melzeme-yen din, bi dest xistîne. Dîsa tê gotin ku 10 cemse, jîpek, dozerek, 2 trektor, 2 firoke (helî-qopter), otobusek û 2 panzer ji aliye gerîlayan ve hatine îmhalîn û li

3 deveran boriya petrolê, trafoyek û 7 direkên telefonê ji hatine rûxandin. Li gorî van agahiyâni di vê mehî de 90 cerdevanî dev ji cerdevanîye berdane û çekên

xwe danîne.

2.2.1995

Pôlisan li Mersinê, li taxâ Barbarosê, du kesen bi navê Suat Yıldız û Feşih Akburak kuştin. Li gorî agahiyênu ku ketin destê me, "Pôlisan li van kesan tu ixtar nekiriye û li erdê gule berdane mejiyê kesen birîndar û ew kuştine."

Di navbera Bismil û Çınarê de cesedên du kesan hate dîtin. Li gorî daxûyaniya waliyê taybet, ew kesen ku cesedên wan hatine dîtin gerîla ne. Li aliye din tu agahî der heqê wan kesan de tune.

Gerîlayen ARGK'ê û leşkeran di 27'ê rîbendanê de li çola Pasûrê şer kirin. Di şer de 2 leşker mirin, 2 leşker û 3 cerdevan birîndar bûn.

Gerîlayen avêt ser

gundê cerdevanen Kani-kana Pasûrê. Di cerda gerîlayan de 2 cerdevan birîndar bûn.

Leşker li Xêzxêra Elîhê derketin operasyonê. Hêzên dewletê bi 70 erebe û zêdeyî hezar leşker û cerdavanan li dora gundê Gomikê û Newala Giyanê operasyonê dikan. Hêj di navbera leşker û gerîlayan de tu şer derneketine.

3.2.1995

Hêzên dewletê li Mêrdinê, gundê Karis-tan, Teziki, Xelesko, Gundir, Kibraş, Xirbiresh, Taxtik û Kemçê dixwazin bidin valakirin. Ji bo vê yekê li ser gundiyan pêkutiyekê dijwar heye.

Gerîlayen ARGK'ê avêtin şer qereqola Meydanê ya Şernexê. Di cerda gerîlayan de gelek leşker mirin û birîndar bûn. Gelek cebilxane ji di cerdê de kete destê gerîlayan.

4.2.1995

Li gorî agahiyênu ku Kurd-A'yê, hefteya borî di riya Qubînê de 3 TIR'ênu bi mayinê gerîlayan îmha bûbûn, bi panzerên Tugaya Mêrdinê barkirî bûn. Der barê zayıyata hêzên dewletê de tu agahî nîn e.

Greva birçîbûnê li Girtîgeha Aydinê kete roja 40'an.

38'an.

Li Xêzxêre hêzên dewletê dest bi operasyonekê kirin. Di navbera gerîlayan û leşkeran de hêj şer derneketiye.

Gerîlayan li çola Licê leşker xistin kemîna xwe di kemîna gerîlayan de 3 leşker mirin, 4 leşker birîndar bûn.

5.2.1995

Mezraya Azê ya gundê Belava Xêzxêre, ji aliye leşkeran ve hate şewitandin. Mezra Azê beriya demekê kurt hatibû valakirin.

Li Elîhê, li Kercewse, li gundê Aynqafê, gerîlayan leşker xistin kemîna xwe. Di kemîna gerîlayan de gelek leşker mirin û gelek jî birîndar bûne li ser hejmara kuşti û birîndaran agahî bi destê me neket.

Erebeyeke leşkeri li Hezexê, li gundê Bedirka li mayîna gerîlayan leqîfî, 2 leşker mirin, ere-be rûxiya.

Gerîlayan li mintîqe-ya Habîzbina Mêrdinê, êrîşî ser leşkeran kir. Di êrîşa gerîlayan de li gorî gotina gundiyan 5 leşker mirine.

6.2.1995

Li Stenbolê, dibin pi-ra Haliçê de 2 kes ji ber ku bombeya wan de teqîya, mirin. Kesen ku mirin li ser wan nasnamayen bi navê Gülsen Özdemir û Mesut Ünsal hatiye dîtin.

Di riya Amedê û Pasûrê de cerdevanen pê li mayinê gerîlayan kirin. Bi teqîna mayinê gerîlayan cerdevanek mir, yek jî birîndar bû.

Gundiyeke li Elîhê, li gundê Sinemirgê hate kuştin. Der heqê kuştina wî de agahiyekê dorfi-re negîhişte destê me.

7.2.1995

Serokê sendîkeya Belediye-İş'ê ya Elîhê Osman Küntes, hate revandin. Li gorî agahiyênu derdorê bûyêrê, ew destê kontrayan hate revandin.

Li Elîhê, gundiyeke Kurda-A'yê, hefteya borî di riya Zaxora tev ji aliye leşkeran ve hatin binçavkirin. Ev gund û gundiyeke de ne.

Greva birçîbûnê li Girtîgeha Aydinê kete roja 10'an.

Navenda Nûçeyan

Ji zaravayê kurdî bi goranî çend şîrên Ayîniya Ehlî Heq

RENGÎ BA RENGÎ NEMANA YARAN

v şîr û helbest bi zaravayê Goranî ne û ji deftera pîroz ên Ehlî Heqa Kerendê Kırmaşanê hatine hilbijartin. Ehlî Heq, ku misilman ji wan re dibêjin: "Elî ulahî", an "Şeytanperest". Hemû kurd in û li navçeyên cur bi cur ên Kurdistan û Îranê dijîn.

Defter û kelamên Ehlî Heq ev in:

1. Deftera Damyarî
2. Dîwana Gewre
3. Barega barega
4. Kelamên Baba Xweşîn
5. Kelamên Çilten
6. Kelamên Baba Serheng
7. Kelamên Baba Celîl
8. Kelamên Wezawer
9. Kelamên Girugiru
10. Kelamên Dîre dîre
11. Kelamên Zilal zilal
12. Kelamên Kilezerde
13. Kelamên qeteya xulaman
14. Kelamên Abîdîn
15. Kelamên Baba Elî Derwêş
16. Defteren Seyd Xamoş
17. Defteren Qoşçî
18. Defteren Xam Elmas
19. Deftera Eîlbegî
20. Deftera Şêx Emîr
21. Deftera Derwêş Zulfeqar
22. Defteren Seyd Birake

Birayênd kurdêñ Ehlî Heq bi ser cema van kelam û defteran re dibêjin kitêb an pirtûka "Serencam". Hemû defter û kelamên Ayîniya Ehlî Heq bi zimanê kurdî û zaravaya Hewramî an Goranî ne.

Kurdêñ Ehlî Heq, her wisa çend defter û kelamên wan ên din jî hene wekî: Kelamên Sultan Sehar, kelamên Şah Ebirahîmî Rojyar an Rocyar, kelamên Baba Yadigar...

Çend şîr û helbest ji deftera Şêx Emîr.

*Salar Saman, Salar Saman
Sultan(1) Serwer, Salar Aman
We nazarı eîşq dîde xulaman
We Nehit(2) Merdan Neqid kelaman
We dîdek Merdan Siyam(3) kird Sîfid(4)
Yawam(5) ew seraw û ser çeşimeî(6) Omîd
Ser ser çeşimeî zîndeganiyen(7)
Darendeî(8) Emîr(9) Cawîdaniyen(10)
Her kes kerdeş(11) kird cenî nенala
Şî(12) ne Miratib Mertebeî fela
Çend şîr ji defter û kelamên Derwêş
Zulfeqarê*

*Goran:
Hamseran(13) rengê(14), Hamseran rengê
Ji karxanewe nema narengê
Ji xanedanan(15) Awaz û Dengê
Niçte(16) bû xoşhal nemam bû diltengê
Rengî ba rengî nemana yaran
Perî(17) Azimayş laf da we karan
Her weqit(18) meyleş bo padişâî keremdar
Rengdaran ji Rah Medo(19) we kenar
Hikimî(20) bala hikim ji Mişriq(21) xîza
Xaiyanan Ne(22) teris per û bal Rîza
Ne qudiret da şemeî Angîza(23)
Şahizade Ne cevir duniya gurîza(24)*

Çend şîr ji deftera Xan Elmas:

*Yara bixiroşo, yaran bixiroşo
Sera ser cîhan(25) wehem bixiroşo
Alem çund kure Hedad(26) bicoşo
Sehira û ser zemîn serbaz bipoşo
Merdan piyaleî mey ecel binoşo
Babo(27) Perî(28) qetil Firzend(29) bikoşo
Firre firre firreî teyare filfewir
Ne Sema(30) Ateş bixîzo we cevir
Ahen Merkeban dewende calak
Bî xof ne kohsar dewan neruiyak
Ji kelamên Sultan Sehak, seroka Ehlî Heq, ku de sedeya 8 koçida jiyaye.
Yar dîde we giyanî rijiyan Dalaho(31)
Westeneş we ne Şaho(32) Balamo
Yar dîde we giyanî Biniyamîn(33) pîre
Pîr Musa(34) Wezîr Dawid(35) destgîre
Yar dîde(36) we giyanî çe weşen(37) yar Mîyo(38)
Mîzganî(39) Mîzganan xawend kar Mîyo
Xas(40) bijene(41) berze Melî
Yarî giyanî yarî cenete Eydos ew dilî*


FERHENGOK

- 1- Sultan: Mebest jî Sultan Sehak Rêberê Serhildana Ehlî Heq e
- 2- Nehit: Pêşbinî, xeberdan ji nehêni
- 3- Siya: Reş
- 4- Sifid: Spî, sipîd
- 5- Yawam: Çûn, dixwazim biçim, herim
- 6- Çeşime: Kanî, kaniya avê. Bi hewramî hana jî dibêjin
- 7- Zîndeganî: Jîyan
- 8- Darende: Xawen, xêw, saheb, xwedî
- 9- Emîr: Temen
- 10- Cawidanî: Ebedî, hemîsegî, nemir
- 11- Kerdeş: Riftar, kirdewe, emel
- 12- Şî: Çûn, herin
- 13- Hamseran: Ey yaran, ey dostan
- 14- Reng: Rast, dostî, (nîreng: narast)
- 15- Xanedan: Malbañî, binemale
- 16- Niçte: Hebû, niştibû
- 17- Pery: Ji bo
- 18- Weqit: Kat, gav, hengam
- 19- Medo: Diran, sefkîşan, rîzbûn
- 20- Hikim: Ferman, destûr
- 21- Mişriq: Rojhîlat
- 22- Ne: Ji
- 23- Angîze: Ho, delîl, eilet, destawîz
- 24- Gurîz: Helatin, revîn, derçûn
- 25- Cîhan: Dunya, gidî
- 26- Hedad: Asinger, hesinkar
- 27- Babo: Bab, bawik, kal
- 28- Perî: Ji bo
- 29- Firzend: Zar, zarok, mindal, role
- 30- Sema: Asîman, ezman
- 31- Dalaho: Navê çiyayekî serberz û pîroz e li Kırmaşan
- 32- Şaho: Navê çiyayekî serberiz, ji binê Sîne û Kırmaşanê
- 33-34-35- Her sê navê mirovên pîrozên Ehlî Heq in
- 36- Dîde: Çaw, çem, çav
- 37- Weşen: Xoşin, xweş
- 38- Mîyo: Tê, dê, hatin
- 39- Mîzgan: Mîzgînî, mujde, şabaş
- 40- Xas: Baş, bêter, nîku
- 41- Bijen: Jenîn, lêdan, tenbûrjenîn

EHMED ŞERÎFÎ

DEFTER

Dînek kevirekî davêje bîrê...



AMED TIGRIS

Carinan mirov di hinek rojname an jî kovar û pirtûkên kurdî de rastî hinek gotinênu tê.

Ew gotin an çewt hatine bikaranîn, an jî hatine çêkirin.

Xwendevanê ku cara pêşî gotinênu wiha dibînin, wê demê kîfa wan tê û dibêjin qey ew rastî xezîneyeke

nû û dewlemed hatine. Baweriya xwe bi wan gotinênu tînin û ew jî dest pê dikin û wan gotinênu diaxîvin û di nîvîsên xwe de bi kar tînin. Her wiha ew gotinênu çewt û çêkirî bi riya çapmeniya kurdî di nava gel de bi awayekî lezûbez belav dibin. Her xwendevan jî, wiha bi çewt û şaş hînî gotinênu çewt dibe. Êdî mirov bike neke wan gotinênu çewt bi salan nikare rast bike an jî bide rastkirin.

Mesela gotina "pêşniyar" jî wan gotinênu çewt yek e. Çiroka vê gotinênu wiha ye.

Li başûr di navbera salên 1954 û 1961'an de, Çapxaneya Kurdistanê bi navê "Hetaw" bi tîpên erebî kovarekê derdixe. Di tîpên erebî de tîpa "r" û ya "z" yek in û li ser tîpa "z" niqte heye. Heger mirov niqteya "z" yê jî bîr bike, wê demê "r" tê xwendin. Di nîvîsareke kovara Hetaw de, dema gotina "pêşniyaz" dinivîsin, wê demê niqteya "z" ya dawî jî bîr dikin û "r" tê nîvîsandin. Ci dibe? Wê demê di şûna gotina "pêşniyaz" de "pêşniyar" tê nîvîsandin. Gotina "pêşniyaz" bi awayekî "pêşniyar" dikeve nava gel. Ronakbîren Başûr ev 40 sal in ku dikin nakin nikarin vê gotina çewt jî nava nîvîskar û gelê Başûr derxin û rast bikin.

Yanî gotina "pêşniyaz" bi kar bînin. Heta ne Başûr, herwiha ev

gotina çewt ket nava ronakbîren Bakur û Rojhîlat jî. Em jî iro bi çewtî gotina "pêşniyar" bi kar tînin. Lê, ci ye? Em bi çîrokê nîzanin.


Ew kesen ku ji ber xwe ve gotinênu çewt û çîrokê nîzakin. Ew kesen ku ji ber xwe ve gotinênu çewt û çîrokê nîzakin. Berpirsiyariya vê yekê pir û pir giran e. Iro bi dehan gotinênu wiha çewt di nava gel de belav bûne ku mirov nikare pêşî li wan bigire. Di Welatê Me de jî mirov carinan rastî gotinênu wiha çewt û şaş tê. Di Welatê Me de kêm in û her ku diçe kêm dibin. Lê, dîsa jî hene. Mirov dikare navê mehan wekî mînaka herî berbiçav bide.

Welatê Me qaşo navê hinek mehan ji soranî girtine, lê nîzanin ku navê mehan iro jî di nava soran de sergîjî û tevlîheviya herî mezin e. Soran de ser navê mehan li hev nekirine û niha jî navê mehan cuda cuda bi kar tînin. Ji ber vê yekê jî, gelek nîvîskarîn soran niha navê mehan bi Latînî dînîvîsinin.

Gotineke pêşîyan heye: "Dînek kevirekî davêje binê bîrekê, êdî hezar kesen biaqlî nikarin wî jê derxin."

Li ser navê zanîn û çêkirinê divê em zimanê xwe yê şîrîn xerab û belav nekin. Her roj tiştekî ji ber xwe ve dernexin.

Zimanê axaftin û yê nîvîsî ji hevdu bi dûr nexin. Dijberê wî, divê em nîzîkî hevdu bikin. Heta jî destê me bê, divê em zimanê gel bi kar bînin.



**Li ser dikê,
di rola Odette de
Alma Munteanu,
di ya Siegfried de
jî Gregor Seyffert
dilîstin.**

LI SER BERHEMEKE ÇAYKOVSKY NIRXANDIN Û TASWÎREKE BI KURDÎ

LI SER TILİYÊN LINGAN REQS, EVÎN Û MUZÎK

Saet di 20.00'an de li Berlinê li Şanoya Komishe OPER'ê bi dengê rîtma daholeke bîlind rîwîngiyek dest pê dike. Çavdîrênen vê holê, dikevin nava deryaya notayan û tevî şahoyên spî li ser ewrên tîrêjan digerin.

Ü Çaykovskî ji xewa bêbinî radibe û dest bi çîroka xwe dike. Lê ev çîrok bêziman tê gotin û çîrokvan jî nîn e. Tîrêjîn rengîn, enstrûmantalê dewlemend, keçen bedew û xortêne qelew dest bi straneke evînî dikan. Ew strana ku li ser tiliyêن lingan bêdeng, bi zimanê laşê mirovan tên gotin, trajediya Sigfrîd û Odeta ye.

Belê Çaykovskî, beste-karê mezin, di berhema xwe ya baleya Gola Şahoyan (Kuğu Gölü) de wekî Ehmedê Xanî, bi e-vîna du xortan, rewşa

Rûsyaya ku di binê zilma Çaritîyê de ye, tîne zimêñ û bi mezinatiya e-vînê, şerê di nava xerabî û delaliyê de li ber çavan radixe.

Sigfrîd, di qesrîn Rûs-yayê de prensek e. Lê ew mirovekî xemgîn û dilsoz e. Wekî der û dora xwe naxwaze bibe şûrekî zilmê li ser gel. Talîma arîstokrasiyê qebûl nake. Ji ber vê yekê, diya wî ya dilsar û zalimê qesrê Rotbart (Rûsor) her tim Sigfrîd di bin çav de dihêlin. Jiyana wî dibe jahr. Rojekê ew rastî Odetayê tê. Odeta, keçike-ke pir delal û nazenîn e. Ji hez hez dikin. Lê zalimê Rûsor dikevê navbera wan. Dibe kelemê e-vîna wan. Odeta û pir hevalêñ wê, wekî wê xweşik û nazenîn, di binê zilma Rûsor de ne. Rûsor nazenîn dîl girtinne. Wan biroj dike şaho,

bîşev dike însan. Sigfrîd ji ber evîna Odeta hiş diavêje. Zêdetirî wê tu kesî qebûl nake.

Wekî kelemê Mem û Zînê, Bekoyê Ewan Rûsor jî li hemberî van herdu evîndaran pir kemînan datîne. Lê bêfeyde, nikare wan jî hev dûr bixe.

Rojen Sigfrîd ji bo dî-tina Odetayê derbas di-bin, Rûsorê zâlim dibîne ci bike bêfeyde ye, li ser wan asîmîn xera dike û herdu evîndarêñ xemgîn dişîne jiyana bêbinî.

Bi mirina Sigfrîd û Odetayê şaho tev difirin, diçin diyarekî din datînin. Ú asîman tarî dibe, ji enstrûmantalan deng dikeve. Gerdûn dibe valayî.

Bi notayê Çaykovskî, dengê defa giran û hişk wekî zilma qesra Çar e. Ew dengêñ zirav û kûr bi wateya evîn û daxwa-

ziya azadîyê re. Di vê trajedyê de Odeta û Sigfrîd bi mirina xwe li dijî zilmê bi ser dikevin û xurtbûna evînê bi mirina xwe nîşan didin.

Ev baleya Çaykovskî ku li paytexke çand û folklorê tê sehnekirin ji aliye lîstikvanen Komishe OPER ve bi kedekî bîlind tê lidarxistin û ji a-liyê Kareograf Tom Schling ve tê idarekirin.

Feylezofen notayan: Çaykovskî

Peter Ilyitisch Çaykovskî di dîroka 7.5.1840'an de ji dayik bû. Seydayê mezin pişti bûyîna xwe, 53 sal şûn de çûye ser heqîya xwe. Vî di emrê kin de bi tiştê ku kir di nava rûpelêñ dîroka muzîkê de cihekî pir girîng girt.

Pişti Çaykovskî, ew notayêñ hatin bidarxis-tin, ji wî rîcêk barkirin û



dema enstrûmental siti-rîn ji bo bîranîna sey-dayen mezin çend dengen xwe bi kul gotin.

Çaykovskî, di navbera salên 1859 û 1863'an de ji bo dewletê karmendiyê dike. Di nava salên 62 û 65'an de jî li Moskovê di-çe konservatuware. Li Petersburgê demekê ji bestekarê mezin A. Rubinstein ders digire. Ev ji bo wî dibe siûdek. Pişti qedandina konservatu-warê mamostetiya teori-ya muzîkê dike. Ji sala 1878'an nêzî heta mirina xwe jî şefê orkestrayan bû.

Koreografi:
Tom Schilling

Muzîk:
Çaykovskî

Libretto:
Bernd Köllinger

Bühnenbild:
Jochen Finke

Kostum:
Eleonore Kleiber

Wêne: Arşîva Şanoya
Komishen Oper

EDELETA TIRKAN Û KURDÎ

Kirdkî (Zazakî)

Mehkema parlementaranê ma kurdan qediyay. Hewawo ki ma pawitînî hemînî ceza wardi. Gurey serekdewletê tirkan çîno, wa riy xwi siya bîko û vajo, "No welat di her kes hezey cê m'emele veyneno." Tirkiya di heq û huquqê kurdan çîno. Kurdî gama ki vajî "ma tirk ï", yê zî sey tirkan wayirê heq û huquqî yî. La eke vajî, "ma kurd ï", huquq- muquq qediyêno. Yanî Tirkiya

di, di sîstemê huquqî estî: Yew qandê tirkan rê, ay bînî zî qandê kurdan rê yo.

Ne ew ro tena, rojo ki cumhuriyeta tirkan awan biya, huquqê tirkan ciya yê kurdan ciya wo. Huquqê tirkan, beylu wo. Heme çî qanunan di amewo nuştîş. Kam çirê sûcdar beno? Cezay kam sûcî ci ya? Heqê kesê sûcdarî ci yî? Welhasili yew sîstem esto. Labelê meselay kurdan sewbî hewa ya. Verî he me çî kurd biyayîş sûc o. Yanî kurd, rojo ki

marda xwi ra beno, sûcdar o. Ebi inhewa, Tirkiya di ew ro xayînan ra teber heme kurdî sûcdar ï. Nê sûcdarê normal zî niyî. Cora kurdî hetanî ew ro, mehkemanê sivîlan di nêameyî mehkemekerdîş. Mehkemeyê ki d'ewanê kurdan ra ewniyayî ya eskerî ya zî hezey ew ro nêmeskerî yî. Mehkemey eskerî zî mehkemeyî huquqî niyî. Nê mehkemey gore bê normanê huquq ê ki cîhana sivîl û modern ronayî, nêguriyêni. Qerarê idamê Şêx Seîd Efendî û embazanê yê, qerarê idamê Seyîd Rizay û embazanê yê çendi huquqî yo? Qerarê ki mehkemanê eskeriyan 1971 di, 1980 di daybi û qerarê ki ew ro danî ci alakay yînî û huquqî pê reyra esta? "Qanûnê terorîstey" û huquq pê nêkewenî? Tirkiya di namey huquqê kurdan bêhuquqey a. Eke ana niya, mesela veşnayışê dewan, qanunê tirkan di çîno. Qanunê nênuşenî ki polisi, timî zerra yînî kam kurdî biwaza şenî bikşî. Qanunî nênuşenî ki kontîrgerîla şeno rojnamerê kurdan bomba biko. Labelê nê gurey heme ew ro benî. Aw semed ra ma kurdî, ganî mehkemanê tirkan ra edelet nêpawî.

Labelê ganî ma bêvind bixebetî, semedo ki heme cîhan bizana ki Tirkiya di, di huquqî estî. D'ewaya parlamentaranê ma, no heti ra gelek muhîm a. Çimkî cîhani heme na d'ewa takîb ke na. Ana aseno ki dewle-

ta tirkan, hinî nîşna ebi zuran, ebi dek û dilavan na neheqey binimna. Eke ma jîhatî bî, bi na d'e-wa, ma şenî na bêbaveya tirkan eşkera bikî.

Ebi na d'ewa yewna mesela zelal bî: Cay kurdan, meclîsê tirkan di çîno. Birayeya tirkan û kurdan zî zorî reyra nêbena. Ma çendi d'ewaya birayey kenî, general û serekê tirkan hîna vêşî ma danî kişîş. Miletâ tirk ra zî veng û hes nevejiyêno. Heta qorî roşinvîran ra teber, tirkî, politîka generalanê destek kenî. Hatîp Dîcle û embazanê xwi tirkan ra ci waşt? Tena va "ma kurd ï." Aw semed ra ceza wardi. Başo, meclîso ki ma heze kurd qebul nêkeno ko ma rî ci havili cê bîba? Na senê birayey a? No ci risiyayî o? Aw semed ra ganî kurdî meclîsê xwi awan bikî. Ew ro şertê awan-kerdişê yew meclîsê a-nasaranî estî. Fikrê kamî ci beno yo zano, kam parti ra beno yo zano, kurdo ki bawerey Mecîlisê Milî yê Kurdanano, ganî nê meclîsî di bîşo ca bigiro. Fikrê xwi eşkera vajo. Meclîs qalan reyra nê, la raşa zî ganî iradey mileti temsîl biko û bîbo yew platformo milî û demokratîk.

Eke ma bişî nê platformo milî di bêrî pê het, zaf meseleyê ki ew ro serey ma dejnenî, ko hal bîbi. Ez bawer keno ki no hingi di, nê guriy ra ferzîr sewbî ciyekî ci- no. Kurdan rî meclîsî milî lazîm o.


J. ESPAR

rokên xwe heta 21.03.1995' an bigîhînin komîsyonê. Çîroknavîsên ku ji derveyî welêt besdar dibin, dikarin çîrokên xwe bîşînin rojnameya Welatê Me.

Encama pêşbaziye wê di meha avrêlê (meha 4'an) de bê ra-ghandin.



Pêşbaziya kurteçîrokan



elbestvan û çîroknavîsên delal û xoşewist, Ko- ma Xanî we dawetî besîrbûna pêşbaziya kurteçîroka kurdî ya duyemîn, sala 1995'an dike.

Xelata yekemin
5000 LS

Xelata duyemîn
3000 LS

Xeleta sêyemîn
2000 LS

Mercen vê pêşba-

ziyê ev in:

1- Divê çîrok nû bin û nehatibin weşandin.

2- Divê dirêjbûna çîrokan ne bêhtîri 10 rûpelan be.

3- Divê her çîrok- navîs tenê bi çîrokekê besdar bibe.

4- Divê çîrok li ser rûyê kaxezê, pak bê nîvîsin.

Kesên ku dixwazin besdar dibin divê çî-

REWEZ

Şerêkî narewa

Nazanim, be rastîş nazanim em kurte nusîne lemer ew şere nabecê, nalebar û qirêjey başûrî welat naw binêm çî..

Gelo xokûjî, kurdkûjî û birakûjî pir be pêstî ew şeren, nexêr.

Berastî êwey bin awa dademînin û naxwazin rîkewtî em core nusînane bin.

Şerêkî narewa, şerêkî naheq û nadirûstyan kirdote karî berde-wamî gelêk û herkese beşe "kergeli" xoy cûda kirdot ewe û cûte le yek deweşenîn,

"gewrekanîş" be çawî eşq û raman ewe lew şere derwanin û bergirî le xoyan û le kergelyan deken. Be rastî ew şere way kird ke bi bîne binêstî gişt demê, dost û dûjminîş be çawêkî tir ewe têman birwanin.

Deçiye her şwênen û cêgâyek, le her der û rîgâyek, le wexit û nawexit da, em pirsiyare na dirûst û naqolaye, le êmey

başûryan dekrêt "erê şer her berde-wame, ha?... A, berde-wame, xwêzor e, xwêni

mirovî kurd herwa herzan nebûwe, belê ta kergel şer bo

ewane biken her berde-wam debêt, yan sibeynêş wekû diwênenê, gewrekan

dest le milanêy yekir deken û dû sibeyîş têheldeçin ewe. Carêk

kêşey zewî biyanûş şer helgîrsandine, carêk gûmirik û carêkîş Hewlêri cîger sûtaw.

Pirojekeyan bes emey mabû, emîş bem zûwane dexwazin tewaw bê "qir kirdinî giyanî kurdayetî", dena cî dexwazin, dizî

dizîtan kird, namûs, namûstan birdîn,

pare, dewlemend bûn, koyleyî, xelik koley bo kirdin, itir çîtan dewê?!

Xizmine... kesîne: Ewane, ew şitaney ke basî lîwe deken "zewî, gûmirik û Hewlêr", hemû biyanû diro û saxten, be qed gewreyî û saxteyî kar û

kerdeweyan gewre û zebelâhin, pêwîst e bew diroyane nekeyin, dest be girfanman da bikeyin û nawikî xûr-may dirokanyan nîşan bideyin ke êsta kawêjî pêwe deken. Herdû la

xoyan be aştîxwaz dezânin, be bêlayen û bêtawan xuyan dexwênenî ewe, cana ewende nasik û bestezimanane qisan deken, pence be demyan da bikeyit naygazin. Be serî na mûbarek û

namûqedesyan çendê bilîy ewende layengir, hander, le jîr ewe bir û agirxoşkerî em şer en. Ewane firçikan be şerî birakûjî git-tuwe û le nawî da

mezin bûne ê diyarîş "xûyek bigîrî be şîri, terkî nakey be pîri", bawer nakem ew xûwe terik biken û ta

ewaneş hebin kurd le sayeyan da nehesêt ewe û şitîk bêşitêk nakat û birakûjîş le

naw naçêt, sedan car em diroyeyan dû pat û sed pat kird ewe "idî nabînin kurdêk xwêni kurdîkî tir birjînî", ay

ke wa nebû, ay-ke petî dirokantur kurtî hêna!

Êstaş em Hewlêr û gûmirke hemû biyanû û biyanû pûc û bêmana, bo ewey bûtlêk, hîc nebê

dilopêk ziyatir xwêni kûranî kurd be riştin biden, dena xo le

Cebârî, Şarbajêr, Hekarî, Qendîl, Qernaqa û Piş Aşanî

le 1964-1984 Hewlêr û gûmirik le destî kesyan da nebûn û nawyan le arada nebû.

SÎRWAN REHÎM

ANKETA XWENDEVANÊN WELATÊ ME

Nav:

Paşnav:

Hûn çend salî ne:

Tehsîla we:

Karê we:

Meaşê we:

Hûn ji ku ne?

Hûn niha li ku rûdinin?

Hûn ji kengê ve bi kurdî dixwînin?

Hûn çiqas bi kurdî dizanin?

- Dîxwînim
- Dînivîsim
- Hem dîxwînim, hem dînivîsim

Zimanê we yê zîmkâkî kîjan e?

Hûn ji kengê ve bi kurdî dizanin?

Hûn ji kengê ve Welatê Me dixwînin?

Hûn ji xeynî kurdî bi kîjan zimanên din dizanin?

Hûn Welatê Me her hejmar dixwînin?

- Erê
- Carinan

Hûn Welatê Me bi ci awayî (ji ku) distînin?

(Ji bo kurdên ku ne li Kurdistanê dijîn)

Hûn ji ber ci sebeban derketine derveyî welêt?

Hûn zimanê rojnameyê çawa dibînin?

- Hêsan (rehet)
- Dijwar (zor)

Hûn kîjan rûpelên rojnameyê dixwînin?

Hûn pêşî li kîjan rûpelan dinêrin?

XWENDEVANÊN HÊJA

.Di vê anketê de du texlît pirs hene. Yê li ku hemberî wan an jî li bin wan cihê bersivê vala ye ji bo dagirtina we ye. Cureya duduyan jî pirsên ku li bin wan çend bersiv hene, divê hûn çeperastekê (çaprazekê) deynin pêşıya yekê an jî çend heban ji wan. Bi saya vê anketê, em difikirin

ku li gorî daxwaz, hêvî û rexneyêne we kêmasyiyêne rojnameyê ji holê rakin û ji bo rojnameyeke xweşiktir guherînên pêwist çêbikin. Berî guherînan emê netîceya anketê jî pêşkêşî we bikin. Piştî dagirtina anketan, hûn dikarin rûpela anketê bibirin an jî fotokopiya wê bikişînin û ji me re bi lezgînî bişînin.

Hûn kîjan rûpelan qet naxwînin?

- Hevpeyvînan

- Nivîsên mîzahî

- Nameyên xwendevanan

- Fal

- Nivîsên zarokan

- Nûçeyen derve

Ji van mijaran hûn kîjan qet naxwînin?

- Yê li ser zimê

- Yê li ser çand û hunerê

- Nivîsên quncikan

- Nûçeyan

- Hevpeyvînan

- Nivîsên mîzahî

- Nameyên xwendevanan

- Fal

- Nivîsên zarokan

- Nûçeyen derve

Hûn xâcepîrsê çedîkin?

- Tenê peyva veşarî dibînim

- Carinan çedîkim

- Her tim çedîkim

- Qet çenakim

Cihê ku em ji nameyên xwendevanan re vediqetînin;

- Zehf e

- Hindik e

- Baş e

Bi dîtina we zimanê kîjan nivîskarêne Welatê Me hêsan (rehet)e?

- Hêsan e

- Dijwar e

- Baş e

Hûn dixwazin di Welatê Me de kîjan nivîskarêne din hebin?

- Yê Botan e

- Yê Xerzan e

- Yê Toran e

- Yê Serhedê ye

- Yê Serhedê ye

- Kurdistanê ye

Hûn kîjan aliyeñ Welatê Me xurt (bas) dibînin?

- Na, wisa baş e

- Na, divê tev reş û spî be

- Erê, gerek e tev rengîn bibe.

Di rojnameyê de en zehf hûn kîjan nivîsan dixwînin?

- Yê li ser zimê

- Yê li ser çand û hunerê

- Nivîsên quncikan

- Nûçeyan

Hûn kîjan aliyeñ Welatê Me qels dibînin?

- Kurt in

- Dirêj in

- Baş in

Di Welatê Me de nûçe (xeber)

- Hindik in

- Zehf in

- Baş in

Ji xeynî Welatê Me hûn kîjan weşanan (rojname û kovar) dixwînin?

Hûn kîjan weşanan diecibînin?

Welatê Me gerek e;

- Dîsa hefteyî derkeve

- bibe rojane

- bibe duhefteyî

- bibe mehane

Di Welatê Me de nivîsên bi kirdkî û soranî;

- Hindik in

- Zehf in

- Bes in

Hûn dixwazin ku di Welatê Me de êdî zehf kîjan mijar hebin?

Hûn siyaseta weşana Welatê Me çawa dibînin?

Di xwendina Welatê Me de ci tensayîyen we hene?

Hûn fiyeta rojnameyê çawa dibînin?

- Erzan e

- Buha ye

- Baş e

Ji xeynî we çend kesen din ji rojnameya ku hûn distînin, istifade dîkin?

Hûn rojnameyê ji malîyên xwe re dixwînin?

- Erê

- Na

- Carinan

Divê ferhengok di rojnameyê de;

- Hebe

- Tune be


- Hebe û cihê wê firehtir be

Dîtinê we yê din hebin li jêr binivîsin;

Civaka kurd civakeke ecêb e. Lazim e bi girîngî li ser bê rawestin û lêkolînên hûr û kûr li ser bêñ kîrin. Aliyêñ wê yên wisa sosret hene ku mirovan heyretmayî dihêlin. Mesela, di nava kurdan de nivîskar ji xwendevanan zêdetir in. Dibe ev gotin ji bo we tiştekî pir ecêb be û wek fikrekî çewt xuya bike, lê li derdora xwe baş mîze bikin, eger pariyek mubelexe di gotinê min de hebin jî, hûnê zûbîzû nikaribin bîbêjin "Ev idîayeke çewt e." Li min biborin, min gelek kurd dîtine ku nizanin bi kurdî baş bixwînin an jî bîpeyîvin, lê xwe ji herkesi zêdetir zimanzan, dîrokvan an jî şâîrên kurdî dihesibînin.

Civaka kurd civakeke ecêb e. Rexne di nivîsandinê de yek ji cureyêñ herî zor e. Ji bo rexnegiriyê zanîneke kûr, nîrîneke fireh, zanistî û iradeyeke azad lazim e. Lê kurd bi giştî dema pêniñvîsê didin destê xwe bi rexnegiriyê dest bi nivîsandinê dikin.

Helbet hingê çavêñ xwe digirin û çi tê ber devê wan dibêjin. Lazim e bi girîngî em li ser sebebêñ wê bisekinin. Civaka kurd civakeke ecêb e. Dema tiştekî nivîsandinê an jî gotinê nayê bîra wan; dema xîret nakin li ser mijar an jî warekî lêgerîn û lêkolînân bikin, lê dîsa jî xwe mecbûr bibînîn gotinan serf bikin, radibin bi navê rexneyê tişteñ eletewş dibêjin û bi vê yekê



JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

Civakeke ecêb

bêhemdê xwe rastiyen înak din. Mesela di hejmara dawî ya kovara kurdî Nûbiharê de kurdekkî ku bi çavê rexnegiran li xwe dinêre wiha gotiye: Rojnameya Welat hem bi nivîsandinê pîrr û biwêjêñ pîrr kêm têñ bikaranîn û hem jî kêmboûna sûretan, însanê ku radihişt vê rojnamê, zûbîzû ji xwe dûr dixist." Werhasil, bi yek cumleyekê rabûye Rojnameya Welat a ku 115 hejmar bêrawestin derket û tevî hin kêmasyîn xwe ve di demeke ku hejmara xwendevanen kurdî bi tiliyan dikaribûn bêñ hejmartin derxiste nizanîm çend hezaran, bi navê rexnekirinê sûcîdar kiriye. Lê ji bo xwedê - bi zanîna min ev ciwanmîr misilman e jî- behsa yek aliyekî baş ê Welata emekdar nekiriye. Li holê înkara hêjahiyeke bi keda hezaran nivîskar û xwendevanen pêkhatî, heye. Halbûkî rexne tiştek e, înakar tiştekî din e. Ji sedî sed lazim e li ser vê yekê jî bê rawestin.

Civaka kurd civakeke ecêb e.

Amerîka biriya 500 salan hatiye keşf kîrin; metodîn zanistê, teknîkîn lêgerîna li ser dîrokê çend sed sal berê hatine dîtin; qeydeyêñ rast-nivîsa kurdî, prensîbêñ rîzimanâ zaravayê kurmancî bû pêncî sal ku têñ bikaranîn. Lê em rabûne ku ji nû ve Amerîkayê keşf bikin. Di şûna li ser van bingehêñ ku hatine danîn, keviran bilind bikin û kêmasyîn hene rast bikin, em rabûne ji nû ve dest bi her tişti dikin û her yek ji me bêyî ku bi yêñ din bişewire, yek hîmî dîrokê, yek yê rîziman, yek yê wergera quranê, yek yê arkeolojiyê û hwîji nû ve datîne çawa ku her tişti bi hatinâ wan re dest pê kiribe. Eger em dev ji vê tewra xwe ber nedîn di nêzîkayê de gerek e em lembeyen elektrîkîn mala xwe jî bişkînen û bavêjin ji bo ku em ji nû ve karê Edîson bikin.

Civaka kurd civakeke ecêb e. Li hemû welatên dînyayê hemû war û şaxen zanistî di nava xwe de hatine beşkirin,

her warek bûye deh şax, her şaxek bûye deh beş. Bi her beşekê re nizanîm çend kes eleqedar dibin û ew jî wan beşan ji bo ku encamekê ji xebatêñ xwe bistînîn di nava xwe de par ve dikin. Lê kurd mîna gelek tiştîn din di vê metodê de jî bilakîs hereket dikin. Gelek kurd hene ku hem dîrokvan, hem zimanzan, hem arkeolog û hem jî çîroknîvîs û şâîr in. Gerek e li ser van hemûyan yeko yeko bê rawestin.

Civaka kurd civakeke ecêb e. Kurdên ku hê berî du salan hatine Stenbolê kurdî ji bîr kirine, hînî tirkîyê jî nebûne. Ku tu ji wan re dibêjî bi kurdî bixwînin, dibêjin: "Heval ez ji dîlê anlamış nakim, lê ne önemli ye. Emê ilerde öğrenmiş bin." Ji bo wî ne "önemli" be jî, gotinê wî ji bo me girîng in. Divê bi lezgînî li ser sebebê di salekê de jibîkirina kurdî bê rawestin. Pêwist e ev yek jî neyê jibîkirin.

Civaka kurd civakeke ecêb e. Carinan gerînendeyen weşanê di quncikê sernivîsa rojnameya xwe de dev ji nivîsandîna rewş û pirsgirêka rojnameyê berdiñin, çavê xwe digirin û bi navê rexneyan tozû dûmanê ji meydanê radikin. Çawa be karê herî hêsan ji bo kurdan rexnegirî ye. Divê le ser vê rewşa ecêb civaka kurd a ecêb, ecêb bisekine.

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyi
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT

Berpîrsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışları Müdürü)
Metin AKSOY

Berpîrsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktör
Sami TAN

Berpîrsiyarê Têkiliyên Gelêri
(Halkla İlişkiler Müdürü)
Rıza Fişek

NAVNIŞAN (Adres)
Ayhan İşık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
249 13 44 - 245 29 91

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ
(Temsilcilikler)

Suriye- Jan Dost
Fener Rojbîyanî
Berlin- Silêman Sido
49-30-69 00 26 95

Bonn- Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49

Hannover- Selim Biçük
49-5721-813 60

Hamburg- A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88

München- Mahmut Gergerli
49-871-670 884

Badenwurttenberg-
A. Rahîm Ayaz
49-75453258


Swed- Amed Tigris
46-8-740 69 81

Amsterdam- Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66

Paris- M.S. Aycicek
33-1-48000401

Atina- Sirwan Reşid
Bekir Bahoz
30-1-3634905

Du Salêñ Nûbihar Biñne Cila




Cild 1
450.000 TL
65 DM

Herdu cilden me: 900.000 TL, 130 DM
Râye cild en vala: Herdu 150.000 TL, 15 DM
(Hegel postî li me ye.)

Li hundir: Bihaya wan li postgiro (posta çeki) ya Süleyman Çevik 658265 razînîn û belgeya razandinê bişînîn navîşana me. Li derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzsehir Şubesi, 1079-30100-3118770

Nûbihar: Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3 Fatih-Istanbul
Tel: (212) 533 75 88 Faks: (212) 524 00 38



Cild 2
450.000 TL
65 DM

- *Ji bo dibistanan*
- *Ji bo komelêñ ku kursêñ zimanê Kurdi didin*
- *Ji bo kesêñ ku bixwazin Kurdiya xwe pêşde bibin*

destpêka Rêzimana Kurdi

Haydar DILJEN
Rûpel: 64, form: A4
Çapa duymen: Jîna Nû,
Tebax 1994, Stokholm
Çapa yekem: Çarçira,
Heziran 1994, İstanbul

Biha: 65 SEK, 15 DM, \$ 8



• Ev pirtük bi metoda înduktîv hatiye nivîsin. Ev metod li ser aktifbûna şagirtan dimeşe. Li gor vê metodê dersdar bes rînşandar e.

• Ev pirtük ji bo pengava navîn (sinifên 4.5.6.) hatiye amadekirin, lê salmezinêñ ku bixwazin qaydeyên gişî yên rîzimana Kurdi fêr bibin, yan jî fêr bikin, divê ji xwe re vê pirtükê peyda bikin.

Navîşanen xwastinê:
Jîna Nû Förlaget
Box: 152 16
161 15 Bromma / Sweden
Fax:(46)-08-801825
Tel: (46)-08-803135

CARÇIRA Basın Yayıncılık
İnebey Mah. Valide Camii Sok. No:50
Kat: 4 Aksaray-İSTANBUL
Tel:(90) 212- 530 68 31
Fax: (90) 212-586 22 31

ALEWÎTIYA RASTÎ QÊRÎNA BINDESTAN E

Di "cepheyê alewîtiyê" de dengekî cuda, rengekî serhildêr; Çağdaş Zülfikar (Zülfikarê Hemdem). Kovareke mehane û siyasî ye. Dengê wê bilind û zelal e.

Çi dixwaze rasterast dibêje. Ji pergalê (sistêmê) re dijber (muhelîf) e. Alîgir e.

Hîn di hejmara pêşîn de balê kişande ser xwe. Hem a dewletê û hem jî ya gel. Kovar hate berhevkirin û Berpirsiyarê Karê Nivîsaran Alî Yeğin jî hate girtin. Dibe ku cara pêşîn e rewşeye wiha diqewime. Di hejmara yekemîn de hem berhevkirin û hem jî girtin. Ev yek dêhna me jî kişand û me bi Gerînendeyê Weşanê Giştî Hüseyin Karataş re hevpeyvînek çêkir.

Hüseyin Karataş ji pirsa me ya "Çima Zülfikar" re bersiva: "Ji ber ku edaletê, wekheviyê û serhildanê temsîl dike" da me. Karataş dibêje ku piştî mirina Hz. Muhammed û bi besdariya qebîleyen serdest û bîhêz ên ereban İslamiyet ji eslê xwe bi dûr ketiye. Ji lew re edetên xwe yên qebîletiyê bi navê İslâmî dane pêş û dest bi talanê, îşxalê, neheqiyê kirene. Ev yek bêhtir di dema Emewiyan de pêk hatiye.

Gerînendeyê Weşanê yê Zülfikar pirsên me yên din jî wiha bersivand.

Hûn ji alewîtiya rastîn a gel behs dikin, ci ye ev?

– İslâm serê pêşîn di nava kesên xizan û bêhêz (bêqewet) de derket pêş. Bi xurtbûna xwe re tesîra qebîleyan şikand û ew xistin bin hakimiyeta xwe. Lê di dema xelfeyan de vê teyfeyê kontrol xistin destê xwe û adetên qebîletiyê yên ereban a beriya İslâmî pêk anîn. Ji İslamiyetê bi dûr ketin. Serwerîtiya xwe xurt kiran. Neheqîtî, talankarîtî, iş-xalvanîtî wekî politikaya İslâ-

mîyetê bi kar anîn. Emewî bêhtir ev ber (teyfe) temsîl dikir.

Reaksiyonek jî li hemberî vê rewşê derket. Mezlûm, bindest û kesên ku nerazîbûna xwe dianîn zimêni li derdora Hz. Alî kom bûn.

Piştî ku İslamiyet bû dînê serdestan, dev ji edaletê, wekheviyê, hezkirinê, aqil û heqîqetê hatiye berdan. Alewîtiya rastîn a gel xwedî derketina li wan prensîbê terkirî ne.

Mebesta we ji bazirganitiya alewîtiyê ci ye?

– İro alewîti jî hin kesan re,

di navbera alewîtiya kurd û tîrkan de ci ne?

– Di dîrokê de alewîtiya tîrkan bi bektaşîtiyê hatiye temsîlkerin. Alewîtiya kurdan jî qizilbaşîti (sorsorîti) ye. Her çiqas bektaşîti alewîtiya tirkmanan temsîl neke jî.


Di sedsala 15'an de bektaşîti bi pergala Osmanî re li hevîtê. Îdî dibe xwedîyê weqf û tekyayan. Ji xezîneya Osmanî payê distîne. Ew çiqas ber bi Osmanî ve diçin, qizilbaş jî ewqas rûyê xwe ji wan badiin. Qizilbaşîti serhildanê wekî adetekî jiyanê qebûl dike. Ji ber vê yekê jî bektaşîyan re

tî" yê hatiye bilêvkirin.

Serê pêşîn li Iranê gotina "şia", "şîî" hebû. Piştî ku li Iranê "şîî" bû dînê dewletê xera bû. Ber bi sunîtiyê ve cû. Vê rewşê kir ku alewîtiye kurd û tirk ên li Enedolê dijiyan, ji Iranê xwe dûr bikin.

Alewîtiye kurd û tirkman, ji bo ku cudabûna xwe ji yên Iranê diyar bikin ev gotina "Alewîtiya Enedolê" bi kar a-nîne.

Di kovarê de hûn didine zanîn ku hûn alîgirê hemû bindest û mezlûman in. Lî bêhtir li ser kurdê alewî ha-



**ÖZGÜRLÜK
ZÜLFİKARIN UCUNDADIR**



**Berga (kapaxa) Kovara
"Çağdaş Zülfikar"**

re, medeniyetê re tênkarkirin. Jê tê xwestin ku bi nasnameya xwe re, taybetiyê yên neteweyî re têbikoşe (mucadele bike).

Em vê yekê bi xetere dibînin û li hemberî derdi kevin. Lewma em pirtir cih didine kurdê alewî.

Hûn hewlê alewîyan ên ji bo xwe birêxistin û partîkirin cawa dibînin?

– İro civata alewîyan ne homojen e. Tiştekî tabîî ye ku cudatî tê de hebe. İro, meseleyen wekî bêkarîtî, xizanî, xwedebarnekerin, kultur, besdariya siyasî û hwd. di rojê de ne. Bi ya min partîyeke alewî nikare van meseleyan hel bike. Ez dibêjim qey ji bo ku van gelşan hel bike ev partî nayê avakirin. Wisa dixuye ku tê xwestin ku hîn bêhtir alewîtiyê bixine bin xizmeta sis temê.

Tiştekî ku divê bê kirin ev e: Bi kurdan, tîrkan û hemû karker û xebatkaran vê divê ku em cihê xwe li gorî fîkrîn xwe di nava têkoşîna civakî û neteweyî de bigirin.

**Hevpeyvîn:
ZANA FARQÎNÎ**



Alewî bi salan hewcedariyên bîr û baweriyên xwe bi dizî dianîn cih. Gerîna Semahê ji alewîyan re wekî "zikra sunîyan" girîng e.

kara bazirganîtiyê ye, parlementerî ye, ji dewletê parstandin e, mafyaya araziye ye... Bi kurtasi, kovar, weqif û tekyayen alewîtiyê dagerandine dergahê qezenc û menfeetê. Cihêtiyê bingehîn û hîmî

murted dibêjin.

Ji "Alewîtiya Enedolê" behs tê kîrin, naveroka vê terkîbê ci ye?

– Bi rastî ez nikarim bibêjim ka ci çaxê ev gotina "alewî-

tiye sekinîn, ji ber ci?

– Bi heqîqeta şer re, hîn bêhtir bi nasnameya kurdê alewî yên neteweyî û dînî tê leyîstin. Ji alewîtiye kurd tê xwestin ku rastiya xwe red bikin. Xizmeten wan ên jî dîrokê

elinewerek

